



ROJA NÛ

kovara huneri çandi û edebi



2
1983

NAVEROK

	<u>Rûpel</u>
Xwendevanên Hêja	3
J1 Xwendevanan.....	4
Şoreşeke B1 Yek D1l û Yek Kulm	5
Du Helbest J1 Osman Sebri.....	10
Serpêhatiya Du Muxtaran.....	11
Gandi û Kurdîstan.....	12
Leşkerên Hêviyê.....	14
J1 Folklor a Me.....	16
Veçilîxe Giridax.....	18
Zîmanên Cihanê û Zîmanê Kurdi.....	20
Pêşketîna Kurdolojiyê.....	24
D1 Kovareke Kurdîstana Iraqê Da Kemal Burkay	27
Kemnade.....	28
Danasîna Kurdan û Mahmut Baksî.....	29
Ez Rodî'me.....	31
Berevkirîna Çirokên Gel û Sê Pirtûkên M.E.Bozarslan.....	32
Qurseke Kurdi.....	34
Sydney-83.....	35
Serketîneke Nû.....	36
Serketîneke Nû.....	38

* D1 hejmara pêşîn da, çend xeletiyên çapê û rêzkirinê j1 ber çavê me revî yane. D1 hejmarên pêşîn da emê van kê masiyan yek yek j1 nav rakîn. Em hêvi darîn ku xwendevanên me, j1 her vê ye kê wê me biborînin.

ROJA NÛ

Xwedi : Komela Karkerên Kurdîstan
L1 Swêd

Berpirsiyar : Rohat
Navnişan : Karlbergsv. 32B. nb
113 27 Stockholm

Telefon : 08-328251
Hesap No : PG. 458980-0

Utgivare : Svensk- Kurdiska
Arbetar Föreningen

Ansvarig Utgivare : Rohat

Adress : Karlbergsv. 32B. nb
113 27 Stockholm

PC. : 458980-0

XWENDEVANÊN HÊJA

Paşi, ji nû va derketina kovara "ROJA NÛ", wê bala pîr kesan kışande ser xwe û gihîşte destê bî hezaran kesan. Ev kovara huneri, çandi û edebî lî gelek welatên cihanê û wusan ji lî Kurdîstanê hat belavkirin.

Ev hejmara duwemin, ji ber rexne, bir-baweri û daxwazên xwendevanan hîn ji pêşta çû, raw-tivdir û pergala xwe berçav kir û wek çapa dest we da hat amadekirin. Roja Nû çawa di hejmara pêşin da ji dabû diyarkirin ku, wê bî bir-baweri û bî alikariya xwendevanan va tevgirêdayi buweşe û jiyina xwe bide ajotin.

Ji bo hingavtî û dîrxîstina hîn kêmasiyên çapê, problemên zîmanê kurdî û hîn pîrsên naveroka xwe, kovara me dîr - dirêj difikire. Guhartin û pêşketina hîn pîrsan, carina ne bî destê mirovane, ew pîrsan hewcedari wextin, ji ber ku her tişt nişkê va, yekten naguhure.

Em baş zanin, weki hêzên kolonyalist çawa hebûnên çanda me helandine, şelandine û çawa rapêl kirine. Hunandin û pêçandina van bîrinan, em bawer dikin ku bî "Xwehesin û Hîşyarbûna Nete-wî" va, wê tendurîst bibe, bîghêje xweşiyê. Ji ber vê yekê me gaveke nû avit û kovara "Roja Nû" derxist.

Kovara Roja Nû, wek hejmara pêşin, lî ser huner, çand û edebiyata kurdî, deng-behs, danasin û karên informatîk wê vir şûnda ji, bide ajotin. Hîn kes dîkarin van karên "Roja Nû" pî-çûk bibînin û bilind bîfîrin. Lê, dema bîna mirovan fireh bibe, toleransa wî hebe, ew dîkare xwe bî lez ji serhişkiyê dîr bî-xe, lê, ev baweri di miroveki da tune be, dilreşî hertîm ser-êşîkê lî ber derê wî.

Şagirt, suxte û xwendevanên iro, bî bawerîya me ew şareza pîspor û rêberên sibêne. Ji ber vê yekê, Roja Nû, di vê hej-mara xwe da xet-sinorên xwe hîn ji fireh kir, di vê çarçevê da cih da efrandin û nivîsarên nîfşa (nesil) nûgihîştî û nû rabi-ye.

Roja Nû, hertîm çavênî, bendewar û hêviya daxwaz, bir-baweri û rexneyên weye.

Roja nû, di xebatên we da, ji we ra serfirazi, pêşketin û gavên fireh hêvi dîke.

Heta hejmara sêwemin, di nav xweşiyê da bîminin hevalên di-lovan.

REDAKSIYONA ROJA NÛ

Ji Xwendevanan

Me ji xwendevanan gelek nême girtin, lê mixabin em nikarin he mû van naman biweşinin. Hetani ji destê me bê, emê di hejmarên din da cih bîdin van namên xwendevanan. Bi silavên germin.

ROJA NÛ

Ji Redaksiyona Roja Nû ra

Ez bi derketina ROJA NÛ va dîlşa bûm. Kovar, ji bo pêşveçûna kultur û edebiyata me pîr girînge. Heya iro kesi ev valahi tîji nekiriye. Derketina kovarê xizmeteke giranbîhaye. Pêwîste ku, nivîskar û ronakbîrên Kurdistanê alikariya kovarê bikin. Xebata çand û zîmanê kurdi xewna dij mîna dîrevîne. Kultura me, hebûna me-

Ye. Ez we û ROJA NÛ pîroz dikim.

MAHMUT BAKSÎ
SWÊD

Ji Roja Nû ra

Pîştî gelek silavan ji Kurdistanê na Îran, ez serketina we dîxwazim, hê vidarim ku, hûnê di nav kar û barên xwe da pêşvekin, serfirazbin.

Ez bi xwe bi zaravê sorani deng dikim, ji aliyê din dîxwazim wusan ji kurmancî fêrbim. Kovara delal "ROJA NÛ" kete destê min. Ez dîxwazim hûn vir şunda ji vê kovarê û hîna materiyalên din ji rê bikin, weki ez nivîsandin û axaftina kurmancî baş fêr bibim.

Ji we ra, ez 4 wêneyên qeşeng di şînim, ku di kovarê da çap bikin. Her wusan ji, pîştî çend rojan, ezê ji we ra hîna stranên Kurdistanê na Îranê, ji navçaya Mahabatê rê bikim.

E . Ş

KURDISTANA ÎRAN

Ji Berpîrsiyarên Roja Nû ra

Bi silavên birayeti;

Hevalên hêja, xizmeteke pîr hêja ye ku, hûn ji bo belavkirina çand û diroka Kurdi dîxebitîn. Bi vê xebata hêja hûn li cihê serfiraziyênc. Hêviya me ewe ku, hûn bihêjin armanca xwe.

Hevalno, îxtîsasa min, li ser ilimê kitêbxana ye. Wek niştîmanporworeki min pêwîst dît ku ez li ser dirok û çanda Kurdi lêkolînekê bikim. Li ser dirok û çanda Kurdi, min hînek materyal bi xwe berhev kir, hînek ji, ji Kitaxana Niştîmani li Wîlyana û ji Kitaxana Niştîmani li pîy textê Avusturaliyayê Sydney, min bîdest xîst. Ev tiştên han bi zîmanê erebî û inglîzî ne.

Bi rasti çand sedemên berbiçav hene ku, min karokî wîlo ji xwa ra wezîfe qebûl kir. Yek, heta iro lêkolîn û berhevkirina literatura ser

çand û diroka Kurdi, bi awakî fire nehatiye çêkirin. Heta iro tenê du bibliografya hatine belavkirin; yek li Iraqê û yek ji li Sovyetîstanê. Her du ji, pîr tiştê lîda hebûn. Belê li ser baboteke taybetî nebûn. Bi awayê kevîna hatine amadekirin û nivîskarên wan pêzanê vî kari nînin. Di cih da ye ku meriv rexne li wan bigire. Ya dudyar ji, bi zîmanê erebî ne hatiye belavkirin.

Hîna sedemên din ji min, ji Dr. Yehya Mohmût gelek feyde dît. Ew bi xwe woşanên Kurdi berhev diko. Ixtîsasa wî li ser ilimê kitaxanê û agahdariyê ye. Her usa ew, serwêrê derxistina rojnama ilimê kitêbxana ye.

Eger hûn bîkarîbin van tiştan çabkin û belavkin ez ji we ra bîşînim. Ji ber ku hûn komelock Kurdîna dîxwazim xîzmeta çand û diroka Kurdi bikin.

Emin Seydo

S.ARABÎSTAN

ŞOREŞEKE BI YEK DIL Û YEK KULM

LÊKOLINEKE ABORI, CIVAKI Û ÇANDI



H. SARWÊRAN

Gelê Kurd iro lî Kurdistanê İnan lî diji zordari û koledariya sed salan, jî bo jiyineke azad-demokrat, jî bo şeref û namûsa xwe, jî bo jiyineke wekhev û aşitîyê bî mêrani lî ber xwe dide. Vi gelê mêrxas dî vê rê da heya iro bî hezaran şehit daye. Her wusan jî, heta biğhêje mafên xwe yê mirovî wê bî hezaran şehidên din bide.

Çawa tê zanin, gelê Kurd lî İnanê, lî diji nokerên emperyalizma Eme rikê, diji cellatan û jî bo ruxandina (hilweşandin) sazumana kevnepereşti bî gelên İnanê ra tevayî şer kir. Çawa diyare, dî nav demeke kurt da, agir û çirûskên şoreşê her çûn pêldan. Dî dawiyê da, diktatoriya Şahê zordest û dezgê wî sero-bîno bû. Ev bûyera mezîn, dibe jî gelek kesan ra xem û xeyal bû. Belê iro lî cihê taca siltanê Arya-Mehri Mihemmed Rıza Pehlewî bawêşin têne kirin.

Bûyerên dirokê tîm û tîm berbi pêş dimeşe, paştî nazivîre û lî diji mêjoktiyê, tedi û zordestiyê kareş şoreşgerî wusan ne hêsaye, jî ber vê yekê jî, iro lî İnanê şerê lî diji zordestiyê ne sekîniye û şoreşê da jo.

Melleyên mêji vala, bî şaşîk, bî rûdan, bî cubeyê xwe va, xwe xîstine dirufê "Mehdiyan" û lî ser rîya şoreşê netewî-demokratîk bûne astengekê mezîn jî bo gelên İnanê. Ev Ayetullah Hacetûl-İslam û İmamê Ümmet û Zeman, iro dixwazî gelên İnanê bixîne lî nav kevnepereşti û tariya bî sed salan. Ew bûne belake reş lî serê karker û zehmetkêşên İnan.

Jî bo karker stûyê xwe nîzîm bîkî û vê sazûmana paşverû va rîza nîşan bîdî, çî jî destên wan tê, yekyek tînin cih. Ev lêdan, kuştî, çirkîrî û dardakîrîn gişt jî bo van armancê genî û kevnarî. Belê bîra sa-

zûmana kevneperest û xwinrêj baş bî-zanbe, gelê kurd duh stûyê xwe xwar nekîr, iro ji nake. Gelê me çawa li dijî diktatoriya Şahê zalim bî cuwan mêri li ber xwe da, xwe avite nav agir û alafê, bê guman wê sazûmana me leyên kevneperest ji hilweşîne û Îrā neke demokrat û Kurdîstaneke xwemuxtar saz bike.

Ji bo vê yekê, iro di navça Kurdîstana Îran da, di bin pêşengiya PDKI-da pêşmergeyên tekoşer bî mîrani şerê partizaniyê dajon. Bî saya vi şeri da iro 60.000 km çargoşe (km²) zêdetir navçeke azadkiri li Kurdîstana Îran pêk hatiye. Ji gelê kurd se-di 70, di vê navça azadkiri da dimîne, dijî. Di vê navça azadkiri da can, mal û namûsa gelê Kurd bî destê pêşmergeyên qehreman da tê parastinê. Pêşmerge bî rêk û pêk şer dikin.

Hejmara van tekoşerê azadiyê ji 10 hezara zêdetire. Ev pêşmergeyên e gid û pehewan, Kurdîstana delal û rengin weka çavê xwe diparêzin.

Ji despêka şer da, heta iro tu car top, bombe û gulebarandin li Kurdîstanê kêmbûn. Bî taybeti ji 6 mehan virda, çawa baran dibare, bî vi tehri li ser gelê kurd da top, gulle û bombe dîbarin, li Mehabad, Senendej Saqiz, Serdeşt, Boka, Banê, Şîno, Nexede û li hêla bakûr bî hezaran top, roket û bombe hatin avitîn. Bî van bûyerên hov û bî kirêt bî sedan gund xirab bûn û hatin şewitandin. Bî hezaran zaro-zêç, bûk, keç, xort, pir û kalê Kurdîstanê şehid ketin. Di dawî ya van 6 mehên dawin da gelek qirkirin peyda bûn. Li gelek gundan 20-30 kes bî hevra hatin qirkirin. Di nav wan da, ji zarokên 5 salî bigre heya kalê 100 salî ji hene.

Pir mîxabin iro gelek kes, di her wari da, Kurdîstana Îranê û rewşa wê baş nas nakin. Bî taybeti şoreşvanê Tirkîyê û Kurdîstana Tirkîyê di gelek pirsên Kurdîstana Îranê da dîkevîne şaşî û xeletîyan. Ev ji kêmasîke mezîne. Em dikarin bêjin ku, ji der pirtûka ku di nav weşanên PKST' da der çûye, ev pirtûka bî navê "Îran û şoreşa Kurdîstana Îran, karekî wus-san hêja nehatiye nivisandin. Ji alî

yê din, gelek nivisarên hêja ji, di nav rûpelên Dengê KOMKAR da hatin weşandin.

Emê di vê nivisara piçûk da, bî kurtî, li ser rewşa Kurdîstana Îranê bisekinin. Di warê revşa aborî, cîva ki û çandi (rewşenbiri) da emê hin pirsan ji hev derinin û xwendevan ro ni bikin.

REWŞA ABORÎ (EKONOMİK)

Ji der beşeke hêla Banê, Serdeşt û Urmiyê li Kurdîstana Îran daristan kêmin. Lê belê deştê mezin û fireh, zozanên bilind pîrîn. Bî taybeti zozanên Bistûr, Benguwin û Nîsûd bî mezinahi, bilindî, sextbûnên xwe va bî nav û dengîn. Pêviste ku em zozanên çiyayê Şaho ji, bir nekîn. Di deştên fireh da titûn, genim, ceh, isot, firangi, balican û xeyar tîn çandin. Di warê fêkiyan da wusan pêşta neçûye. Zêdetir gûz, tiri, sêv, hirmê bî taybeti li hêla Serdeşt, Şîno, Nexede û Şarwêran peyda dibin.

Heyan û dewar xweyikirin ji beşeke aboriyê li Kurdîstana Îranê pêk tîne. Li gelek cihan ji pez tê xweyikirin. Cih bî cih heyane serî gir bî taybeti li hêlên sinor hesp û hestir pîrîn. Ji bo çûyin-hatîn û qaçaqtiyê ev heyanan pîr bî rûmetin. Çandin û heyan xweyikirin bî taybeti bî metodên kevnar va dajo. Aboriya Kurdîstanê di her wari da, nemaze di van salên dawin da hatiye xirabkirin. Sazûmana kevneperest dorgirtina (ambargo) aborî daniye li Kurdîstanê. Ev dorgirtin di her warê jiyînê da xuya dibe. Lê, em dikarin bêjin ku iro li Kurdîstana Îran ji nan û pîvazan zêdetir fişek û gulleyên pasdaran dîbarin.

Li Kurdîstana Îranê havinê germeke zêde heye. Zivistanê ji sur-sermaseqem û befirêke zor dibare. Li Kurdîstana Îranê li hêlên hundur da em dikarin bêjin iqlîmekî nerm heye.

Li Kurdîstanê pirani pêtrol li hêla Kermanshah der tê. Di warê deranina pêtrolê da, çawa tê zanin Kurdîstan pîr dewlemende.

J1 av û çeman ji gelek feyde tê girtin. Çemê mezin Zêyê Piçûke. D1 warê çandinê da ev çem û robarana ro leke mezin dilizin.

L1 Kurdistanê hejmara axayên erdê (ax) b1 hejmar bin ji, kême bûne. Lê belê, l1 hêla Soma-Biradost û Mir geverê eşirti û axati giraniya xwe dajo. L1 hêla Mehabat û Bokanê beşeke axan diji şoreşa Kurdistanê Iranê derketin, wan pişgirtiya sazumana kevneperest kirin, d1 dawiyê da ji revin, çûn bûne caş. PDKI ji dest da ni ser ax û malê wan, partiyê ev axa l1 gundiye xizan û bê ax belav kir.

L1 Kurdistanê Iran peywendiyên kapitalist ketine nav aboriyê, l1 p1r jarin. Tenê burjuvaziya bazirgani (ticari) p1r xurte. J1 ber ku çina (sî-nîf) karkeran, d1 her warî da pêşda neçûye. B1 p1rani gundiye xizan, gundiyên niv-hali, karkerên demî ku kaxanan da dixebitin û karkerên ku d1 karên umimi da dixebitin l1 v1r hene. Esnafê piçûk û eşrafê bajaran ji beşeke civatêne. D1 warê çandinê da malhebûna mezine xîsûsi kême. Karke-ri û emeleti b1 p1rani, d1 warê çan-dina axê da dajo.

L1 Kurdistanê Iranê, d1 navbera bajaran da rê hene û navbera wan da mirov nikare bêje peyvendi hatine qetandin. Lê belê riyên hatin-gûyinê bê ziftin. B1 p1rani stabilizene. L1 gundî, riyên maşinan p1r kême. D1 nav van salên dawin da b1 pêşengiya PDKI û b1 piştgiriya destê mirovên pêşverû û welathez l1 hinek hêlan gelek rê hatin çêkirin. J1 ber tunebûna benzîn û mazodê, kêmasiya kadroyên teknîkî, riyên zêde tunenin.

Aboriya Iranê iro d1 nav astenge ke mezin da maye. Betali, bûhabûn roj b1 roj zêde dibê. Perê wan hêjayî tişteki nîne. Karxane (pavlike) him sedem şer (şerê Iraq-Iran), kêmasiyên kadroyên teknîkî, him tunebûna maddeyên xam û j1 van hemûyan zêdetir sedemê zihniyeta kevneperest rê nadin ew pêsta herin, zêde bin. Ev yekana rewşa abori l1 Iranê jar û qels dîke. Emîsyon û enflasyon her diçe zêde d1 be. B1 kurtî jiyina rojane p1r dijwar bûye.

Em dikarin bêjin, l1 Kurdistanê

b1 taybeti karxane û cihên xebatê, j1 der hêla Senendej û Kermanshahê tune, ku l1 van cihan ji dezgehên piçûk û refinerê petrolê hene. Dema mirov Tehran û Kurdistanê hemberî hev dîke bêkari û betali du-sê caran ji Tehranê zêdetire. Mesele, l1 Tehranê benzîn 9-10 tûmene, l1 Kurdistanê 26-29 tûmene û d1 sûka reş da tê firotin, ku p1r caran ji peyda nabe. Rewşa tiştên xwarin-vexwarinê ji wusan buhaye. Çay, şeker, nift (gaz) û hewcadariyên pêvist l1 gundan da kêmin. Gundî ferze herin bajaran.

J1 ber vê rewşa dijwar qaçaxçiti û sûka reş tesireke mezin l1 ser aboriya Kurdistanê, pazara wê nişan dide. L1 gelek cihan bazarê umimî b1 demî (derbazok) û hertîmi tînen vekirin. Pazar cihê kirin û firotinê ye. D1 nav sinorên bajaran da, l1 gundên azadkiri, carina hin pazar peyda dibin. Ev pazaran hin rojên kîvşkiri da vedibin. J1 penêr, çek, gulla bigre heta firotana heyana, fêkiyan û derziyan d1 bazaran tînen firotanê. D1 nav çar azadkiri da firotana heyana û deraninên wan b1 girêdayî destûrê ye. Benzîn, mazot, nift, tiştên xwarinê û hewcadariyên rojane, p1r dijware dîkevîne Kurdistanê, j1 ber ku hemû ev tiştana, j1 aliyê dewletê da qede xene weki tîkevîne Kurdistanê û kontrol roleke hişk heye. J1 ber ku riyên d1 kevîne bajarên Kurdistanê, pasdar û leşkerên Xumeynî hemû ev rê girtine. J1 aliyê din çimento, ar, benzîn, mazot û tiştên xwarinê yên ku malê dewletê ye, an j1 malê axa û çaşanî peşmerge carina dest didine ser wan.

PDKI b1 tehreki rêk û pêk bazara Kurdistanê kontrol dîke, buhayê tiştên kirin-firotanê l1 gelek cihan b1 xwe tespit dîke.

Weki me l1 jor ji got, çandin, z1 raet l1 Kurdistanê b1 metodên kevin û va tî çêkirin. Lê, kême be ji, cih b1 cih traktor, zîbilê çêkiri (sûnî) û avdanê va p1r hêlan erd baş tî reşandin û çandinê. Traktor, j1 der çandinê, zêdetirin j1 bo çûyin - hatinê tî xebitandin. Giya, genim, ceh b1 dasuk û tirpanê va tî dirûn (çinin). Cot b1 p1rani b1 hêzên gava dajon. B1 taybeti l1 Kurdistanê kartol, nisk,

nok û lobi (fasulye) tên çandin. Serdemê zêde heyan xweyikirinê, firehiya çayir, mêrg û firêzeyane.

REWŞA CIVAKÎ (SOSYAL)

Lî Kurdistanana Îran lî der beşeke hêla Kermanshah gel hemû baweriya xwe bî mezhebê Sunni tine. Lê belê, lî Kurdistanê tesira dindariyê bî tehreki hişk û zordari va najo. Ser da jî, mirov dikare bêje serbesti zêdeye. Bî taybeti lî her gundeki da mîz geftek heye û hejmara kesên nimêj dîkin jî pîrîn. Kesên ku naxwazî nîmêj bîkin, kes bî çaveki nebaş va lî wan nanîhêre.

Pêvîste ku em bêjin jinê (pirek) Kurdistanê jî dî vî wari da gelek serbestin. Bî kurti çî bî nimêj, çî bî ne nimêj, jî gelê Kurdistanê ra mîzgeft bûne dibîstana şoreşê. Bî tehreki serbest, dîlxweş pîrs-problemên şoreşê, bî hêsayi dî civin û axaftînan mîzgeftan da, lî gundan tîn peyivandin. Gelê Kurdistanê, jî vî tiştî pîr kêfxweş dibe, dema nimêja xwe diqedinin, paşê jî bo kar û barên netewî-demokrati bî hevra dîçîne civînên partiyê.

Rewşa jinan lî gor beşê Kurdistanê dî, lî Kurdistanê Îranê hin jî pêş ketiye. Nemaze peywendiyên navbera jin û mêran pîr başin. Dîsa dî parvekirîna kar, dî nav jin û mêran da wekhevîn. Heq û mafên jinan, dî warê civaki da, bî tehreki demokratik va pêk hatiye. Mafê zewac, jin û mêrberdanê, hîlbijartin, hat hîlbijartinê ser bîngehên wekhevî û demokrasîyê hatiye danin. Hin bûyerên keç revandinê, jî aliyê zagonên PDKÎ'ê jî hev tîn deranînê, safî dîbin. Jî aliyê dî, dema serêşîk, problemek û bûyerê ke mezî dî nav gundiyan da peyda dibe, ew, partiyê agahdar dikin û jî partiyê alikariyê dîxwazî.

Bî kurti em dîkarin bêjin, dî navça azadkîri da, dî her warê jîyînê da, bîyarên partiyê probleman hêsartîr dîke.

Lî Kurdistanana Îranê êş û janeke mezî hebe, ew jî tunebûn û kêmbûna doxtorane. Jî aliyê dî derman kêmtîn dîtin. Dî navça azadkîri da tenê

çend doxtor û nexwaxanek heye. Ew jî bî destê PDKÎ'an da hatiye saz kirin. Jî her milyonek mirov ra doxtorek dî keve. Dî nav şerê germ û giran da, çarîna pêçandîna bîrineke piçûk dibe problem, jî ber tunebûna doxtoran hin mirov can didin. Dîsa jî ber tunebûna tiştên xwarînê, bîrçîbûneke veşartî û vekîri heye, gelek kes jî ber vê yekê carna nexwax dîkevin.

Sala bori tenê lî hêla Nexede PDKÎ dîji nexwaxîyan û jî bo parastîna xweşîya mirovan 8449 derzî lî wan xîstî.

Lî tu cîhên Kurdistanana Îranê, dî navça azadkîri da, doxtorên zarok û jinan tuneye. Tenê bo demkê doxtor jî derva tîn. Kêmasîya hacetên tîbbî, kêmasîya cîhê razandîna nexwaxan û jî ber gelek sedemên dî jî, ev doxtorên jî derva tîn, xêra wan zêde naghêje nexwaxan.

REWŞA ÇANDÎ (KULTUREL)

PDKÎ, 30 sal dîjî dîktatoriya Şah her wusan jî, ev 4 sale lî dîji sazûmana kevneperestan bî mêrani şerêkî çekdari dajo. Jî aliyê dî dî warê hînbûn-hînkîrîn, çand, huner û jî bo pêşketîna bîr-baweriyên xurt, xebeteke perwerdegariyê dajo. PDKÎ dî navça azadkîri da, dibîstanên pêşîn û navîn vekîr. Cara pêşîn elfabayeke bî zîmanê kurdi, jî bo sînîfa yekem bî tipên erebî hat çapkirin û lî dibîstana belav bû. Vê gavê jî dibîstana vekîrine û bî sedan zarok lî ber destê mamosteyê şoreşê, jî bo rojên pêş, xwe dîghînin.

Nîspeta xwendî û nivîsandîna lî Kurdistanê pîr kême, naghêje %20'an. Ev hejmar dî navçê hundîr da hin jî kêmtîr dibe, dî nav jinan da ev nîspet naghêje %5'an jî.

Lî Kurdistanana Îranê gel bî taybeti bî zaravê (diyalek) soranî deng dîke. Lî hêla bakûr beşeke kurdan bî zaravê kurmançî dîpeyivîn, hejmara van kesan lî hêla Makûyê hin jî zêdeye. Lî Kermanshah û Hewreman jî bî Lori tîn axaftî. Zîmanê farîsî, zîmanê duwemîne, gelek kêmtîn elîmandî. Bî tîpên erebî û zîmanê kurdi gelek pîrtûk û broşur hatî weşandin. Dî vî wa

ri da jî Kurdîstana Iraqê pîr doku-
ment dîkevîne Kurdîstana Îran û ge-
lek kêrî wan tê.

Pêvîste bêjîm ku lî Kurdîstana Î-
ran, dî warê huner , çand , dî
warê karên edebî da gelek pêşva çûye
Jî aliyê dîn, pîr efrandinên hêja û
klasîk, jî zîmanên biyani hatîne wer-
gerandin.

Dî nav nivîskar û helbestvanan da
gelek simayên hêja hene, ku seriyê
van bî xwe Dr. Qasîmlo dîkşîne. Her
waha Hejar, Kanîk, Heymîn, Kerîm Hesa-
mî , Mela Evdîlayê Hesanzade (Heya-
ki) û gelekên dîn jî bî van karan va
mijûl dibî.

Çawa tê zanîn Dr. Qasîmlo bî na-
vê "Kurd û Kurdistan" pirtûkeke pîr
hêja nivîsiye û lêkolonîke başe.
Kerîm Hesamî "Jiyîna Lenin û Tekoşî-
na wî", "Dayîk", "Zemîna Piçûk", û
"Mihemedê Zîrav" wergerandiye zîmanê
kurdi. Vê gavê jî, lî ser "Çîrok û
metelokên kurdi" û "Felsefa Sosyali-
zme" dîxebite. Jî der van karan, bî nê-
vê "Şerê Partîzani" û "Şehîdên Me"
du pirtûkê wî jî hene.

Dîvê, dî vê nivîsara kurt da, lî
ser rojname û kovarên lî vîr der di-
kevî jî, deng bîkîm. Kovara "KURDIS-
TAN" Organa Komîta Navbendî ya PDKI
ye. Ev kovara mehê 2 curan derdikeve.
Cureyek bî zîmanê kurdi (hemû bî ti-
pên erebiye) û cureyê dîn jî bî far-
sî derdikeve. Heta niha nêzkaya 100
hejmari der çûye. Bî taybetî dî warê
çandî û edebî da jî PDKI karekî bêhem-
pa pêk tîne. Em dîkarîm bêjîm, dî nav
şoreşê da şerê qelem û tîfîngê bûye
yek û bî hevra tê meşandin. Herwaha
kovara "TEKOŞER" jî, jiyîna xwe dîde
ajotîne. Disa komîta bajarê Mehabatê
bî navê "PÊŞEWA" kovareke kurdi û me-

hani derdixe.

Komîta bajarê Banê bî navê "ŞE-
HÎD" bî zîmanê kurdi û farîsî, Komî-
ta Nexede bî navê "YEKÎTÎ" bî zîmanê
kurdi, azeri û farîsî, komîta Şîno
bî navê kovara "KÊLEŞÎN" bî kurdi û
farîsî, lî hêla Avşar bî navê "HAWARÎ
AVŞAR" û rêxîstîna Ararat jî bî navê
"ARARAT" rojnemeyên mehîni derdixî.

Jî der van rojneme û kovaran di-
sa pêvîste bêjîm, jî aliyê rêxîstîna
"YEKÎTÎ LAWANÎ DEMOQRATÎ KURDISTANÎ
ÊRAN" an da jî kovareke kurdi û farî-
sî bî navê "DENGÊ LAWAN" derdikeve.

Wek tê zanîn, dî jiyîna gelan da
karên folklorê û sazbandiyê cihêki
giring digrî. Lî Kurdîstana Îran
folklor û weşanên folklorî pîr pêşta
çûne. Sazbandî û muzîk bûye perçeki
jiyîne. Dengbêj û sazband bî alîkari-
ya akardyon, kîlarnet, kemence û de-
fê va pîr stran-klamên gelî dîbê-
jî. Instrumenta "baxleme" get tuneye
û def-zurne jî pîr kême. Listîka bî
navê "CERGEBEZ" (jî û mêr dîkevîne
mîlê hev û bî hevra dîleyîzî) bûye
edet. Govendên kurdan bî cûdabûnê
piçûk hemû lî Kurdistanê tîne geran-
dîn.

Lî Kurdîstana Îranê pîr dengbê-
jî (goranîbêj) navdar hene, wek He-
sen Zîrek (mîriye), Nasîr Rezazî, Mi-
hemed Mamîlî û Tahîr Tofîq. Tahîr To-
fiq bî taybetî merşên şoreşgerî dîs-
tîrê û bî xwe jî, jî Kurdîstana Ira-
qê hatiye. Lî Kurdîstana Îran, dî wa-
rê karên bestekariyê da jî pîr pêşva
çûye. Tenê lî ser cejna Newrozê 300
heb helbest hene, jî vana nêzkaya 40
libî hatîne bestekîrîn. Disa pêvîste
bêjîm, jî bo rojên navdar û jî bo bî-
ranîna kesan, gelek helbest bî xwe
bûne klam-stran.

DU HELBEST JI:

OSMAN SEBRI

Helbestvan û ronakbinê kurd Osman Sebri dî sala 1905'an da li gundê Narincê, li Kurdistanê Tirkîyê hate dinê. Paşî serhildana Şêx Seid (1925) ew gelek caran tê girtin, lêdan-tedayên mezîna dibîne û bi salan Tirkîyê rojên xwe di zindanan da derbaz dike, paşê, ew jî ber van zordestiyar neçar dimîne û diçe Kurdistanê Suriyê.

Dema, ew li Suriyê ma, bi aktîfî dî nav karên politik da cih girt. Ji aliyê din dî nav rûpelên kovara "HAWAR" gelek caran ef-randî û helbestên Osman Sebri hatin weşandin.

Dî sala 1979'an da li Ewrûpê bi destê Hemreş Reşo gelek helbestên wî hatin berevkirin û di nav partûkeke bi navê "APO" da ew dane çapkirin.

Osman Sebri niha jî li Şamê dimîne û karên xwe li wir dajo.

* *

Ev helbestê jêrin, jî aliyê Osman Sebri, da li ser navê kovara "ROJA NÛ" hatiye şandin û heta niha tu cihêki da nehatiye çapkirin.

BIJÎ WELATÊ MIN

Dîvê em xwe pêk binin, jî bo felatê xwe.
Bijî serbilind weki çiyayên welatê xwe.

Berên xwe nedîn hevdu û şerên hev nekîn,
Bes rêya gelparêziyê li pêş wan vekîn.

Welat jî me dixwaze, xebat û tekoşin,
Ne canxulami, nokerî û serî danin.

Serê ku bête danin tucar nayê hildan,
Bî qelsî kes nebûye, xwedî rûmet û şan.

Rûmet serxwebûne, digel ramanek xweser,
Holê, jî bona gel em dikarin bîbin rêber.

Rêber serîye nabe li pê gel bimeşe,
Tucar natewe, mirin jê ra gelek xweşe.

Rêya felatê pêş me dike ew ravekare,
Li pêşberî gel û dirokê berpirsiyare.

Rêberî ne karê tewtewe û qelsane,
Dîji koletî, canxulami û pisane.

Bî qelsî nikarin serê gel hildan rakîn,
Welatê xwe bîstînin gel tê da azakîn.


Dîvê bî xurtî em berên xwe bîdîn neyar,
Bî jîrî û zanatî millet bîkîn hîşyar.

Bijî welatê min, jî bona te gorî can,
Sond dixwim ku bîbim pandî jî bo Kurdistan.

SERBILINDÎ

Xwe danînim bo sîtem û zorê,
Dîvê serbilind ez biçim gorê.
Gava bî rûmet çûme goristan,
Hêjaye bîbim lawê Kurdistan

12.5.1983



Serpêhatiya

Du Muxtaran

LEZGİN



Dêrik, gundeki gelek bî şans bû. Çıma? Ma çiyê Dêrik ji gundên din cuda bû? Wek hemû gundên din, ew ji, bê rê bû, bê dibistan bû, dijwariyên wê ji dijwariyan ra digot wêda here... Lê tişteki vi gundi hebû ku, li tu gundeki din tunebû: Muxtar Şemo. Şemo pir şareza û bê perwa bû. Serda tırki ji dızanibû... Wek muxtarên gundên din, li ber çawiş û "başefendi yên" romê, lal û bê zıman nedima. Çên di çend caran gundiyan xwe ji ber hê qaret û zirzopiya cendırman xelaz kiribû. Lema Dêrik bî şans bû, herkesî xweziya xwe pê dıanı.

Çiroka muxtarê Çilkaniya Quli herkesi dızanibû. Rojekê cendırme di ser Çilkaniyan da dıgrın. Wek hercar pêşiyê li derê muxtar dıxın. Bi zirzopi û pozbilındi, Quli dibine meydana gund, li ber çavên gundiyan jê tiştan dıpirsın, xwedênegıravi yê ku di vi gundi da hıneki karıbüye tırki ji hev derxe, Quli büye. Lê Quli ji, xên ji "peki", "başostine", "başefendi" tişteki din nızanibüye. Çawiş, çı ji Quli dıpirse, Quli dibêje "peki başefendi". Çawiş bıkuşe ji, Quli dısa dibêje "peki başefendi". Di dawiyê da "Başefendi" emır dıde cendırman, dibêje: "Ka ez we bınınım hün çawa muxtar 'peki' dıkın!". Muxtarê gund Quli, di hewşa berderê mala xwe da, kutaneke nepıvayi dıxwe. Li ber çavên gundiyan, kumê wi li aliki dıfire, pêlavên wi li aliki. Bi kurtaya peyvê, wê rojê, Quliyê belengaz nivmırı davêjine nav nivınan. Goştê kutayi datının ser morayı û reşayên cendegê wi. Jına wi Eysê, ji halê mê rê xwe da dıgrı û dızare: "Ürtreşo kê ji te ra go, tu li eskeriyê tırki hinbi û li vi kavili bibi muxtar".

Muxtar Şemo ji, gelek caran ji cendirmên dewletê, ji "Başefendiyan" teda ditibû. Lê tu demê neketibû rewşa Quli. Ew bî gundiyan ra, gundi bî wi ra bün. Ne cendırma dıkarıbü li meydana gund, li Şemo xıstana, ne ji Şemo ew firsend dıda wan ku, ew li gundiyan teda bıkın.

Serpêhatiyên Şemo û memûrên dewletê pir hebün. Rojekê selefêke siwara li pêşberı gund xwiya kır. Wê gavê, titûnfiroş hatıbüne gund, li berderê muxtar çawalên titûna Mûşê danıbün, gundi ji lê cıviyabün, bazar dıkırin. Şemo famkırıbü ku, siwarên tên cendırmene, lema beri ku ew bıkevıne nav gund, wi ji gundiyan ra got: "Qet ji hev belav nebin, destê hev bıgrın, li dora titûnfiroşan govendê bıgerın". Li ser vê gotınê, Dêrikiyan, piçûk û mezın, dor bi dor govend gerandın. Heta wê rojê, dilanên rasti ji usa xweş û bi şayi derbas nebibün.

Şemo ji nav cıvatê derket, xwe ber da bintara gund, li ser riya wan sekinı. Di nav cendırman da, qaymeqam ji hebû. Qaymeqam ji Şemo ra "Ew çı qelebalixe, millet çıma li hev cıviyaye muxtar ?!" got. Bersıva Şemo wek herdem hazır bû. Wi got: "Qaymeqam beg, dilana lawê mın, xulamokê te ye. Fermo hün ji werın dewata me". Ma Şemo nızanıbü ku, "başefendi" yên dewletê nayêne dewat û şaiyên gundiyan?... Ew nesekinın, ji gund derketın çün, govend hê dıgeriya.

Gandi û Kurdistan



Dî van çend heftên derbas bûyi da filma GANDÎ lî pîr welatan deng da û di dayîna xelatên "ACADEMY AWARD" ya sala 1983'an da heşt xelat standin. Filim bî xwe filmeki başe, lê ew tiştê ku, jî yê din bêtir lî cihanê bî nav û deng dike, nav û felsefa Gandi ye.

Navê wi rast MOHANDAS KARAMÇAND GANDÎ'ye, lê ew bî navê MAHATMA GANDÎ tê nas kirin. Ew dî sala 1869'an da lî Hindistanê hat rûyê dinê. Dayka wi jîna bavê wî ya çaran bû û ew bî xwe jî çûktî rê zarokên dayka xwe bû. Dî sala 1888'an da Gandî lî İnglistanê dest bî xwendina qanûnê kir. Wek pîraniya "cihana 3'an", ew jî hîni pîr sinciyên Ewropîyan bû û ket bin tesira nivîskar û filosofên İnglistanê. Dî sala 1893'an da Gandî bû avûkat û jî İnglistanê çû Afriqa Jêr. Hukmata wi welatî, wek ya îroyin jî, zor rassist û neheq bû. Karkerên Hindistanê jî lî wir dîhatin ditin û zordarîke xirab lî wan dibû. Gandî bî xwe carekê jî trêne hat avêtin çûku ew dî vagona dereca yekemîn da rûniştibû û lî wi wela tî jî ew dereca ya gewrane (yên sipî). Dî nav ew rewşa neheq û rassist da bir û bawerîya Gandî dest bî gubertîne kir û hat hêvan kirin. Xebata wi ya sosyal dî nav kakerên Hindistanê da baş hat naskirin û lî İnglistan û Hindistanê jî navê wi belav bû. Dî sala 1914'an da Gandî vegeriya welatê xwe û dest pêkir dî nav gelê xwe, dî gund û bajaran da bigere. Dî navbera salên 1914'an û 1919'an da Gandî felsefa xwe lî ser teoriya PASÎFİZM'e, jiyana xwe lî Ewropa û Efriqa Jêr û lî ser pratîka xwe ya bî gelê Hindistanê ra bervehev ani. Dî demek kî da wi roleke mezî dî hundîr partiya KONGRÊS ya Hindîsyani da jî list.

Nav û dengê Gandî lî hemû hêlên Hindistanê belav bû û ew êdî bî navê MAHATMA (ruhê mezî) û yan jî bî navê BABO (bavo) hat nas kirin. Daxwaza Gandî ew bû ku, ew Hindistanê rîzgar bike, lê bê şer, bê xwînrijandin û bê dijîmîntî. Wek pêxember ÎSA, wi jî di-got: "Ger yekî sîle lî hêla rûyê te yê rastê xîst, tu hêla çepê bide wî". Lê Gandî jî gelê xwe ra ev jî got: "Bîla ew (leşkerên İngliz) lî wexî, we dî bin lîngan kî, we dî zîndanî kî; çî dî kî bîla bîkî, hûn lî wan vemegerînin, lî wan mexî, lê tu çaran jî ya xwe nemînin, jî xwestîna xwe paşve nekêşî, jî armancên xwe nezîvîrin". Dî pratîkê da Gandî bî xwe ev teoriya pîr çaran ani çî. Dema ew lî Afriqa Jêr bû, wi xwest kaxeza nîfûsa xwe bişewtî ne, jî bo ku ew wusa siyaseta hukmatê ya şaş protêsto bike. Dema ew nêzîkî lî agir kî, leşker şîvek lî vî xîst çûku wi şewtandîna kaxezê wek îhanetkî lî dijî hukmatê hasîband, lê Gandî meşa xwe berdeham kî. Leşker şîvek dî lî xîst û yek dî ta ku Gandî ket xwar, lê disa ew jî ya xwe nema û kaxez şewitand.

Gandî xebata xwe ya siyasî berdeham kî. Hêdî hêdî wi xwe jî hûndîr û derva da guherî û bû yek jî gel; yanî xwarîna wi, çekên wi, axaftîna wi, hemû bûn wek yê gundiyan. Jî hêleke dî da ew bê westan jî bo yekîtiya gelê xwe dixebitî. Qedr. û qîmeta wi cem

Hindûyan û Musilmanan yek bû. Dî sala 1947'an da Hindistan rîzgar bû, lê Mahatma Gandhi ev rîzgarî bî hêstîran qebûl kir çûku ew jî bo Hindistanek bî hevre dîxebitî û wî hêvî dikir ew gelê welatê xwe dî bin alekê da bî azadî bîbine, lê bo xatîrê oleperestan û fenûfûtên İnglistanê, Hindistan bû du welatan, yek jî bo Hindûyan û yek (Pakistan) jî bo Musilmanan. Dî sala 1948' an da ev peyayê mezin bî destê qafîşkek (serserîkî) olperest (yek Hindû) hat kuştin. Sedem ew bû ku, Gandhi lî dîjî şerên dî navbera olperestên herdu olan bû û ew çarkê lî dîjî şerek oli (dînî) ketîbû grêva birçîbûnê û tîştêk nexwarîbû ta ku ew şera hatîbû seknandin.

Nîha em jî xwe pîrs kîn: Gelo ger Gandîk me jî hebe, ev felsefa wî pasîfîst dikarîbe mafên gelê Kurd û rîzgarîya Kurdîstanê bî de standîna ?

Bersîva vê pîrsê bêguman NA ye.

Mahatma Gandhi lî Hindîstanê pîr çaran hat girtin, lê ew tîm dihat berdan û tu çaran dî welatê wî da, tadeyên mezin û lêdan ne hatin serê wî. Têv ku hukmat lî dîjî wî bû, hukmata İnglistanê tu çaran, ne dî girtîgehê da û ne jî lî derwa, kuştîna Gandhi nekîrîbû armanca xwe. Hukmateke wek İnglistanê çîqa nejadperest be, çîqa xwinrêj be, çîqa dilreş be jî, ew tu çaran bî paşvamayîn û neheqîya xwe nagihê welatekî jî yê nîroyîn ku lî Kurdîstanê zordarî û pelîxandîna mafên mîrovî dîdomînîn. Bîbe-nabe İnglistanê na vê gelekî, dî dîroka xwe da tu çaran înkâr nekîrîye û îro jî tu zîman jî qedexe nake. Mîrovekî wek Gandhi nîkare rojekê jî xebata xwe ya sîyasî lî Kurdîstanê, bî awakî eşkere bîdomîne, ne ku hîn lî gund û bajaran bigere, dî civat û meşan da lî dîjî şaşîyên hukmatê bîpeyîve û bî rojnamevan û mēvanên beyanî ra bê tîrs hevpeyîvanan çêke. Hukmata Îsrail îro bî nerîndî û neheqî lî cîhanê deng daye, lê disa jî, ger bî dîlpakî yan na, dadegehek Îsrailî Şaron, wezîrê cengê, jî wezîfa wî avêt der, çûku tîliyên wî dî bêtârên Sabra û Şetîla da hebûn. Dîroka Kurdîstanê bî bêtârên wek Sabra û Şetîla dewlemende. Ta roja îro jî çend wezîr û zabît jî bo kuştîna û serjêkirîna mîrovên Kurd jî wezîfên xwe hatîne derxîstîna? Gelo Gandhi wê dîkanîba îro jî eşkere lî Kurdîstana Tîrkîyê bigerîya û bang kîra: "Werîn em jî bo mafên xwe û lî dîjî neheqîya hukmatê bî yekbîn û dengê xwe rakîn jor". Mîrovên wek Gandhi lî Kurdîstanê sax namînin; ger ew neyên kuştîna jî ewê jîyana xwe dî zîndanana da, dî bin tade û neheqîyê da derbaz kîn. Hukmatên îro jî lî ser Kurdîstanê fersendê nadîna gulana ku ew bîbîşkîfîn û bîna xweş lî dora xwe belav kîn; ew gulana ber bîşkîfandîna wan dî çîlmîsînîn.

Lê disa jî, dîvê em jî felsefa Mahatma Gandhi faydê bîbînîn. Dîvê em gelê xwe nas kîn, wek wan bîjîn, wek wan bîbeyîvin. Dîvê xortên ku jî Ewropê vedîgerîn Kurdîstanê, pozên xwe lî hember karîker û cotkarana bîlînd nekîn. Dîvê em razek Ewropîyan û yê nîdîna ne kîn, lê jî zanayên wan fêrbîn tîştên rînd û ev tîştan gor psîgolîjîya gelê xwe têkîn pratîkê. Bîbe-nebe, dîvê zanayên me lî ser gûndên me bigerîn. Dîvê em rêkê bîbînîn û gelê xwe hokîna yekîtiyê jî bo ew bî sedan, bî hezaran, bî sedhezaran derkevîna meşan û dengê xwe lî dîjî neheqî û zordarîyê rakîn. Dîvê partîyên şoreşgêr berê gel hişyar bîkîn, çûku şoreşek bê pîştgîrtîna gel tu çaran bî ser nakeve.

Bekir ŞAHİN



Leşkerên Hêviyê

Ev helbestê jêrin li ser zarokên cihanê, bi destê HEMÊD BEXDÎRAN'ê hatiye nivisandin. Cara pêşin ev helbestê dirêj di rojnema "Tîşrin" da çap bûye, (6/5-1983-Şam).

Ev helbest, bi destê heval ÇANKURD jî zimanê Erebi hatiye wergerandin.

(1)

Werin zarokno
Zarokên welatê min
Zarokên hemû welatên cihanê !
Em jî çavên xwe hêstirên sotinê
dudiliyê û keserê binalin
Em dest pê bikin lawjanê-stranên xewê
Em hemû lawjanan bikin yek
û bi yek dev...
Bila bi bahoza ra li hemû cihanê belav bibe...
Dî derya û çiyana ra
Bî bajarên mezin ra
Dî Okyanosana ra...

(2)

Gava ez piçûk bûm
Navan ez ditirsandim :

Iskender Mekdoni, Cengizxan
Daryosê zordest û Kipiyadês
û gava Temırleng dihat bira mın
Mın tugi ser axê dıkir !
Ez jı darên rengê hovan ditırsım
Weke çawa hûn jı kuştewarê Givara
û Lomomba, kuştewarê gelan heznakın...

(3)

Dı seferên şevi yê n xewna mın da
Ez bı Huseyn û laşeyên beriya Kerbelê da
dımam.. Lê, hûn dı xewnan da,
laşeyên ku dı dev segan da dibının,
Lı beriya Sinayê..
Sebra û Şatêla..
Sor û Seyda... Silvador û Pritoriya..
Kêr dı stûyê çûkê daye...

(4)

Gava em piçûk bûn.napalm tune bûn.
Lê birweriyên bı şewat
Sungiyên serbazê reş, dı leşkerê
"General Goro" da...
Em çıqas digıryan -Ez digıryam- me zarokan
bı ser şehidên deşta "Girname" da
û çiyayên "Estoriya"...
Çıqas dı bira me da bûn,
Ayinên "Hemze, Huseyn û Rustem"...
Lê, hûn bı navên "Cemile û Givarayê mêrxaz
Zoba û Mezlom" dipeyvın...
Çı rojan ez ne bı "Danton û Mara" ra bûm
Ez bı "Babof" ra bûm ...
Lê, hûn, bı mın ra, niha, Mehmod Derwiş
Semih Qasım û Tewfiq Ziyad dixûnın...

(5)

Werın ey zarokên welatê mın
û zarokên cihanê..
Em rêzên xwe bıkın yek
pêlên jı xeydê
pêlên jı hezkırinê.
Hevre em bılıvın
û lı wir... Lı hêviya nan û chokola
Lı hêviya dêmên kenok, yê n dayikan..
Em şer bıkın dostino !
Zarokên welatê mın û hemû cihanê
Dıji çekên Neutroni û Emerika..
Jı bo defteran, nıvisaran û avê
Jı bo ezmanê şın û fırından
Jı bo genım û gulilkan û baxan
Werın em bıcıvın, hemû piçûkên cihanê !
leşkerê me,wê pır mezın be
Jı çendek zarokan,
leşkerê me wê berbı rojên şırin û
ronak.. bımeşe...!

Ji Folklorê Me:



"EZ XECIM, XECA DÎNIM,
EZÊ SERA RES LI SER ÇAVÊ XWE BISIDÎNIM
EZÊ XWE BI SIYABENDÊ XWE RA BIGHÎNIM"

SIYABEND Û XECÊ

Serpêhatiya (hikyat, destan) Siyabendê Silivî pîr serpêhati-ke kevne. Ev serpêhatiya kevn û şîrin wek serpêhatiyên Memê Alan, Silêmanê Sîndî dî nav gel da pîr belav bûne. Ji ber vê yekê ji gelek tehrên wan (variyant, şax) dî nav gundiyan da peyda bûne. Kes nîzane, ev serpêhati çî wextî û cara pêşin çawa derkotîye me derê. Lê belê ji gotinên wê tê femkirinê, wêki ev serpêhatîke bî sed salan kevne. Ji ber ku, çaxa Siyabend dî kerikî vê serpêhatiyê da besna xwe dîde, wusan dibêje:

Ez Siyabendim, Siyabendê Silivî
Xwediyê tir û kevnanê zivî.

Çawa tê xuyanê ku, ev serpêhati dî çaxên tir û kevn da hatiye gotin.

Lî hine hêlên Kurdistanê, ji vê serpêhatiyê ra dibêjin "Çiroka Siyabend û Xecê". Ev serpêhati bî nexşên evinîyê, dil û hevhezkirinê va hatiye xemilandin, ew bî xwe dîloke. Lî rojhilâtê wek Leyla û Mecnun, Ferhad û Şîrin, lî rojavayê wek Romeo û Juliet û Pol û Virjîniye. Ji navê Siyabendê Silivî ji mirov tê derdixe, wêki Siyabend bî xwe ji hêla Silivîye. Niha navê vi bajari Silvanê dema îslamîyetê ji navê vi bajari danîne Fargîn, an ji Miyafargîn.

Ev serpêhati bî taybetî lî dorberê Silvanê (Fargîn) pîr belav bûye û bûye kerikî folklorê me (zargotin). Em lî jêr dixwazîn bî kurtayî navroka vê serpêhatiya xweşik û şaxê wêye lî hêla Silvanê raberi xwendevanên kovara "ROJA NÛ" bikin.

MIHOVÊ MECÎT

Xecê bê dilê wê girtin dane xortekî. Siyabend dema ev yeka bihist, roja dilanê (Dewat) çû Xecê ji destên heft birayên wê û destgirtiyê wê hilanî, revand bire serê çiyayê Siyan û Xelatê.

Rojekê Siyabend serê xwe datîne ser çoka Xecê û dî xew da diçe. Ji dûr va garanekî (kerî) gakovîyan der baz dibe û diçe ser delavan. Dî navgaran da çêlekek, conegayek û heft gayên mayîn hebûn. Conega dî rex çêlekê da diçû û ne dihişt her heft ganêzîkî wê bînin. Her çîberbî çê-

lekê dihatin, bî qilochên xwe lî van dixîst.

Xecê wexta ku ev tiştê dit, mala bavê wê, heft birayên wê û şerê roja revandina wê hate bira wê. Ma Siyabend ji, çîma wek vi conegayî Xecê ji destên heft mêran nestend û nerevandinbû.

Dilê Xecê pê şewitî û dest bî gîri kir, dema Xecê gîriya çend hêstîrên çavên wê, ketin ser rûyê Siyabend û Siyabend pê hişyar bû, paşê ji Xecê ra got: "Ronîya çavên min, evîna dilê min tu çîma digri?"

Xecê nexwast ku vi tîştî jê ra bêje. Siyabend ji pey neket. Dawiyê da Xecê got: "Siyabendo keriyek (garanek) gakovi derbaz bûn, çûn ser avê. Di nav keri da çêlekek, conegayek û heft ga hebûn. Çaxa min ew ditin, roja ku te, ez ji destê heft bira revandim hate bira min. Min, ji xwe ra got heke wê rojê yek ji me bihata kuştin, kesê kuştî ji tu bûyayi, paşî vê yekê, ez kelogiri bûm giriyam.

Siyabend rabû tir û kevane xwe hilda ku here wi conegayi bikuje. Xecê ket pêşiya wi û lava kîr ku neçê. Kîr ne kîr Siyabend guh neda wê, Siyabend berbî delava wan çû.

Siyabend conega lî dora çêlekê dit û da ber tir û kevana. Tîrek lî bin cengê conega ket û conega kete erdê, çêlek û gayên mayin ji revin. Conega birindar bû. Siyabend çû ser, stûyê wi girt, ku serjê bîke. Conega jî êş û tîrsan lî ber xwe da, destê Siyabend jî stûyê wi filiti, lingê wi şemiti û jî hevraz kete newalê. Di keraxa newalê da dareke benki (benîştok) û hişk hebû.

Siyabend lî ser piştê firiya kete ser darê û şaxeke darê dilê wi hîngavt, jê ra derket.

Xecê demekê sekini û lî benda Siyabend ma, lê Siyabend nehat. Rabû da ser şopa wi û xwe gihande ser cendekê gakovi, lê Siyabend nedit, paşê lî dora xwe nihêri, dit ku Siyabend wê di çî halidaye.

Siyabend hên saxe, wê çaxê di navbera Siyabend û Xecê da dilokên pîr bî şewat despêdikin, Xecê xwe dîghine Siyabendê xwe û dilorine :

Ez Xecim, Xeca dinim,
Ezê şara reş lî ser çavê xwe
bîşidinim,
Ezê xwe bî Siyabendê xwe ra
bîghinim.

Wextê ku Xecê xwe avit newalê, ew jî difire dîkeve lî ser Siyabend û herdu jî bî hevra, di nav paşîla hev da dimrin, dîçin dilovaniya xwe.

Çawa tê gotin, niha jî lî bînya çiyayê Sipan û Xelatê her sal, dema bahar tê, di wi cihî da derxên gula şîr dîbin û gakovi tîn wan gula dîqurçiminin.





Vecîluxe GIRÎDÂX

Çı rojên xweş bûn... Şin û şênahiyên me û cinaran tev derbazdibûn. Zarok, dik û mîrîşkên me li erdê, dîyê bixêriyên me ji li ezmin tev li hev dibûn. Deriyê me tîm vekirî bû. Mêvanên me kêm nedibûn. Em ji dîçûne mêvaniya cinaran. Me dîxwar, vedîxwar û dest bî çirok û stranan dîkir. Canbêzarê cinar aliyê henekan da bê hem pa bû. (Gelo hin ji diji?) Gava wi dest bî qewlîkan dîkir, dibû pîrçiniya me, em hemû dîkeniyan... Ew rojên xweş weke xewnekê win dabûn...

Lê rojekê ewrên reş teyrokên xwe ser me da barandin. Şefaq bû, ku dikên sibê hin nexulxulin, bû teqe-teqe deriyê me. Ez û Eysan firine ser xwe. Keçîka me ya di hêlekanê da vecîniqî û bû vajîniya wê gîriya. Eysan çû cem keçîkê, min ji bî wi lezi deri vekir, ku çî bibînim, sê cendirma û qumandar tîfîngên xwe berbî min girtin. Gundirik dane min û ketin malê. Ji kulinê heta stêr geriyan. Zîravê me qetya bû. Qumandar qeydek destê min xîst. Ji çavên Eysa nê hêsîr weke baranê rijîyan, xwe avête piyên qumandar û bî dengê ki tîrs: "Meke heye mala xwedê ye, hûn mêrê min kudan dîbin, wî bîbaxşînin min û zarokan". Cendirmeki li Eysanê da, Eysan xwe va çû, weke kezewa min ji pêra qutkiri bû.

Em rêketin. Wexta bû êvar li serê çiyaki ketin qeroqolê. Wan ez pîr kutam û paşê avetin zîndanê. Min fam kirî bû, çî qewmiye. Beri çend rojan şerê Kurdan û lêşkerên Îranê çêbû. Çend Kurd ji sinor derbazbûn hatin gundê me. Sê kes ji wan du şevan bûn mêvanê min. Çî hebe muxtêr mîxbûriya min kirye. Şev û rojên min di tariyê da, bî keri nane tîsî û iskane av va derbazdibûn.

Rojekê qumandar bî cendirmeki va hatin, ez ji zîndanê derxistim. Ew cendirme min ra nas hate xuyanê. Wexta min dilê xwe da di go; "gelo ev ne İbrahimê kurê Qasîme", qumandar ji wi ra got: "Îb rahîm wi bîde pêşîya xwe, bîbe ber sinorê Îranê. Êdi tu dizani ka

rê te çiyê". Mın da pêşiyê, ew ji bî tîfînga xwe va pey mındihat. "Tu İbrahimê Qasımı wusane?" Deng nekır. Mın serê xwe zıvırand û bala xwe dayê, hesır tîji çavên wi bûne. "İbrahim! Tê bî mın çî bîkî?" Serê xwe ber xwe da kır û got: "Apo qumandar gote mın wi bibe sinor, gulekê berdê, bîkuje". Nişkêva xofek kete dilê mın. "İbrahim! Em gundiyên hevın, vê yekê bî mın neke, kulfet û zarokên mın wê belengaz bın." Bû bédengi. Ro hêdi hêdi diçû ava, tirejên wê ser berfa Gridaxê dıbrıqın. Hış serê mın da nemabû. Mirata mırınê rûsare. Qasekê em gıhıştın sinorê İranê. İbrahim tîfînga xwe dani erdê, ez hemêz kırım û dest bî gırinê kır. Ez metelmayi bûm. Paşê bî pêçiya xwe gundeki İranê nişan kır û got: "Apo bireve, he re û cardın venegerê". Êdi sekinandına mın nebû. Serejêr ketım na va zevıyan, revıyam. Dûrve dengê gulekê hate guhên mın, qey İbrahim gula mın avête hewa. Nivê şevê hatım gundeki İran... Gund û bajaran gerıyam, dawiyê da hatım pışt Gırdıdax, vi gundî star bûm.

Belê, heft, serast heft sal qedıyan. Niha nabêna mın û gundê mın Gurcıblaxê da Gırdıdax heyê. Pır bilinde, nahêle, ku Eysanê, za rokan û İbrahimê candfêda bîbinım... Her roj, her gav dibêm:

Ax, ax

Veçılxe Gırdıdax ,
Bîbinım Gurcıblax...

M. ARARAT

I. Beşikçi Ne Tenêye

Sosyolog û nivîskar İsmail Beşikçi, jî ber bawerî û ramanên xwe, iro di zindanên faşist da tê girtin. Çawa tê zanin ev alimê Tirk, bî xurti û bê perwa piştevaniya azadixwaziya gelê Kurd dike. Jî ber vê pirsê, ev di nav 11 salan da 3 caran avitine zindanê.

Par, cûnta faşist 10 sal ceza jî Beşikçi ra birî, jî ber ku wi, jî UNESCO'ra namek nivîsandibû û di vê namê da qala Gelê Kurd û idolojîya Kemalîst kiribû. Beşikçi, di vê nama dirêj da, zordestiya 11 ser gelê Kurd û paşverûti û şovenizma idolojîya resmî teşhir dike.

Fedekari û mîrxasiya vi alimê de mokrat, ne tenê di nav gelê Tirkîyê û Kurdistanê da, herwusan 11 derwayî welat jî pır bi denge. Rêxistinên nav-netewî yê demokratîk û Amnesty International 11 Beşikçi xwedî derdî kevî û zordestiya 11 ser wi protesto dikin. Heta niha Amnesty 3 caran



İsmail Beşikçi Di Girtigehê da
tê xuyan

bî xurti 11 Beşikçi xwedî derket, jî bo berdana wi, kampanya imza vekır. Sala çûyî payizê Beşikçi, jî aliyê Amnesty Int. wek girtiyê mehê hate nişandan. Çawa tê zanin, isal jî klû ba PEN (rêxistina nivîskarên cihanê) 11 London û kluba PEN 11 Swêd, Beşikçi wek endamê şerefê hılbıjartin.

Gelê me û mirovatiya pêşverû 11 cihanê, jî Beşikçi ra sempatîke germ û kûr nişan dide.

ZIMANÊN CIHANÊ Û KURDÎ

ROHAT

Çawa zımanzan (filolog) dîdîn xuyan iro lî cihanê bî hezaran zıman hene. Jî vana, hinek lî hêleke fireh da tîen dengkırın, hinek cihê dengkırına wan tenge. Disa hinek pır pêšta çûne iro bûne zımaneki edebi, jî vana hinek jî ewqas pêstaneçûne, tenê tîen dengkırın, bî nıvisari rêke dūr û dirêj hilnedane. Lê tışteki zelale, weki her zımanek gramatikeke wî heye, bî hezaran peyvok (gotın, kelime) dî wî zımani da hene, tehrê dangan, tehrê rêzkırına peyvokan û avahiya zıman jî zımanên dın tîen veqetandinê, jî hev cudane.

Jî aliyê dın, disa çawa zımanzan dîdın kıvşê, lî hemû cihanê hıne zıman hene, dî nav xwe da nêziki hevın, xususiyetên wan bî hev çûne û mirov dıkare bêje, weki ew zıman bûne cınar û pızmanên hev. Bî vî tehrî, ev zımanan bî vê nêzıkbûnê û wekhevîbûnê, jî hın zımanê dın dūr ketine û dî nav xwe da jî bûne malbatekê (familye) jî ber nêziki û cudabûna hın zımanan, filologan anıne ew kom-kom kırıne, kırıne hın beşan û navek lî van guruba zımanan kırıne. Wek guruba zımanên İndo-Ewrûpi, Hami-Sami (zımanên Ereban), guruba zımanên Tırkan û guruba zımanên Çın-Tıbetê...

Tışteki dın jî heye, carına jî filologan anıne gurubeke mezın kırıne çend komên piçûk, jî ber ku, dî nav gurubekê da çend zıman hene, hın jî nêziki hevın û jî çend zımanên dı gurubê da hene, jî wan dūr ketine. Wek guruba zımanên İndo-Ewrûpi têda hın komên piçûktır jî hene; koma zımanên Germen, zımanên Slav, İtalyan-Romen, Kelti û koma zımanên İran.

İro hemû zımanzan ciheki da dıghêjıne hev, weki zımanê kurdi jî ber hın xususiyetên xwe dî nav guruba zımanên İndo-Ewrûpi û dî nav xwe da, jî ber ku pır nêziki hevın jî, dî nav koma zımanên İrani da cih digre.

Emê dî vê nıvisara xwe da ÇIMA ZIMANÊ KURDÎ Dİ NAV GURUBA ZIMANÊN İNDO-EWRÛPÎ DA CIH DIGRE? bersıva vê pırsê bîdın.

Dı keriyê pêşın da emê lî ser nêzıkbûna zımanê kurdi û zımanên İndo-Ewrûpiye dın bisekının. Paşê, peywendiyên zımanê kurdi û İrani dî nav hevda, wê dî vê nıvisarê da bîen ronıkırın. Bî vî tehrî, em bawer dıkın ku hın baweriyên idologên kolonyalistan jî, emê derxın ronahiyê. Wê diyar bıbe ku, ev baweriyên, pıç, faş, xelet û çewt nıkare van idologên vırek bıbın tu ciheki.

★

İro, cihgirtına zımanê kurdi dî nav guruba zımanên İndo-Ewrûpi da, filolog lî ser çar xalan (deqan) şırovedıkın.

1- Navbera hın zımanên İndo-Ewrûpi û zımanê Kurdi da, çawa hatiye ditinê, weki gelek gotın (peyvok, xeber) tehrê wan pır nêziki hevın û mena wan jî yeke. Lî jêr dı misalên "Hıngıv" û "Stêr" dı vî wari da nızıkbûna zımanê kurdi û zımanên Germani xweş nişan

ni me dide. Çawa tê zanin zimanên Germani komeke zimanên cinarin û di nav guruba zimanên Îndo-Ewrûpi da cih digre.

Elmani	Hollandi	Swêdi	Engilizi	Kurdi
<i>Honig</i>	<i>Honing</i>	<i>Honung</i>	<i>Honey</i>	<i>Hingiv</i>
<i>Stern</i>	<i>Ster</i>	<i>Stjärna</i>	<i>star</i>	<i>Stêr(k)</i>

Xên ji koma zimanên Germani, koma zimanên Slavi ji komeke mezine û di nav guruba zimanên Îndo-Ewrûpi da cih digre. Çawa ziman zana ditiye ku, navbera zimanê kurdi û zimanên Slavi da ji nêzikbûneke pîr mezin heye û gelek gotin wek hev in, misal :

Rûsi	Bulgari	Kurdi
<i>Brat</i>	<i>Brat</i>	<i>Bira</i>
<i>Jena</i>	<i>Jena</i>	<i>Jin</i>
<i>Muj</i>	<i>Mij</i>	<i>Mêr</i>
<i>Mış</i>	<i>Mışka</i>	<i>Mışk</i>
<i>Jizn</i>	<i>Jivot</i>	<i>Jin (jiyin)</i>

Zimanê Elmani, zimaneki koma zimanê Germaniye. Koma zimanên Germani di nav guruba zimanên Îndo-Ewrûpi da cih digre. Di vi warî da, dema em lê dînhêrin, gelek gotinê wek hev di navbera Elmani û Kurdi da hene. Ev yeka ji xuya dike ku, zimanê kurdi bi xwe diçe dîghêje zimanên Îndo-Ewrûpi. Bi vi tîhî navbera zimanê Kurdi û zimanên Tirkî, Erebi da tu nişanên nêzikayê tunin. Ji ber ku ev zimanan, zimanên Îndo-Ewrûpi ninin. Misal:

Elmani	Kurdi	Elmani	Kurdi
<i>Kurz</i>	<i>Kurt</i>	<i>Binde</i>	<i>Bend</i>
<i>Neu</i>	<i>Nû</i>	<i>Können</i>	<i>Kanin</i>
<i>Eng</i>	<i>Teng</i>	<i>Name</i>	<i>Nav</i>
<i>Wurm</i>	<i>Kurm</i>	<i>Brader</i>	<i>Bira</i>
<i>Eisen</i>	<i>Hesin</i>	<i>Bratin</i>	<i>Braştin</i>
<i>Warm</i>	<i>Germ</i>	<i>Keller</i>	<i>Kiler</i>

Bi kurtebiri dema mirov li van misalan dînhêre cihê zimanê kurdi, di nav zimanên cihanê da xwe kîvş dibe. Hin xebat û karên etimologiyê hene, weki ji mera di vi warî da pîr tiştan nişan dîdî.

2- Çawa tê zanin, di nav zimanên Îndo-Ewrûpi da hemû nav bi maskulin (cînsê nêr), feminin (cînsê mê) û notr tîhî naskirin. Zimanê kurdi da ji, hemû nav feminin an ji maskulinin. Ew xususiye ta navan, wek tê zanin di zimanê koma tirkî da tune. Di zimanê kurdi da du cînsên bîngêhî hene, misal :

Destê min (Tîpa ê nişana navên maskuline)

Mala min (Tîpa a nişana navên feminine)

Angori cînsê navan cinav (pronov) ji, bi navan va pêvîste hev bîhî û angori navan cuda bîhî xebitandin, wek

Wi (ewi) got - Maskulin form

Wê (ewê) got - feminin form

Cinavên pîrsiyari da ji, ev yeka baş tê xuyan, misal :

Kijani got - Maskulin form

Kijanê got - Feminin form

3- Disa dı gelek zımanên İndo-Ewrûpi da gotın (peyvok, xeber, kelime) dema tên xebitandin, ew ditewın, bingehê wan diguhırın û dikevin tehreki dın. Misal ;

Nan - Ji mın ra nın bine
 Şıvan - Şıvın got
 Aş - Salih çû eş

Ji ber vê yekê, zımanê kurdi bi xususiyetên xwe va pır nêziki gelek zımanên İndo-Ewrûpiye.

Ev xususiyeta, dı fêlan da hın ji zelal tê xuyanê, misal gotın mastareke (infinitif), lê dema mirov vê fêlê dikşine, wek "Ezê bê jim" (gotın) diguhure, ditewe û dibe formeke dın.

4- Dı kurdi da dema, hine wextan da fêl (verb) têne kışandinê lı paşiya fêlan pirtikên kesan serda zêde nabın û hemû tehr wek hev tên dengkırın û nıvısandın. Lı jêr çawa tê ditın, dı zımanê tırki da wusan nıne û dı dawıya kışandına fêlan da pirtikên kesan ji hene, misal fêla hatın ;

Kurdi	İngilizî	Rûsî	Tırki
<i>Em hatın</i>	<i>We come</i>	<i>Mıy prişli</i>	<i>Biz geldik</i>
<i>Hûn hatın</i>	<i>You come</i>	<i>Vıy prişli</i>	<i>Siz geldiniz</i>
<i>Ew hatın</i>	<i>They come</i>	<i>Anı prişli</i>	<i>Onlar geldiler</i>

Lı çar misalên jorin da ji, çawa diyar dibe ku, zımanê kurdi, ji gelek alıyan va nêziki hın zımanên İndo-Ewrûpine. Dı nav vê cı-narti -nêzikaya van zımanan da pır faktorên dıroki, cıvaki û geog rafik rol listine.

★

Dı nav gurubên zımanên cihanê da, koma zımanên İndo-Ewrûpi wa reki fıreh dıgrın û lı cihanê gelek belav bûne. Ji Ewrûpayê bigrê, ji rojavayê berbi rojhilatê heta Hindistanê dirêj dıbin, ji ber vê yekê ji, navê vê koma zımanan danine "İndo-Ewrûpi".

Çawa me dı despêkê da ji dabû kışê, dı nav guruba zımanên İndo-Ewrûpi hın komên zımanan, ji ber nêzıkbûna xwe dı nav hevda ji komên dın hatın cihêkırın. Ji van koma yek ji "Koma zımanên İrani" tê navkırın, wek zımanên Germanî û Slavî...

Koma zımanên İrani iro lı ser erdeki fıreh belav bûne û ji aliyê pır gelan da tên dengkırın. Dı nav vê komê da ev zımanên jêrin tên axaftın; Afgani, Taciki, Farsî, Belucini, Kurdi, Oseti û gelek zımanên kêmaniyên piçûk.

Zımanê farisî dı nav zımanên İrani da navê zımanekiye. Lê, çarına navê koma zımanên İrani û navê dewleta İranê hın kes tevlihev dıkin.

Dı dewrên pır kevn da, hemû mirovên (qewm, eşir) lı ser erdê Asiya Pêşin star dıbûn, navê van dıhate zanin bi ARİ, çawa tê zanin dı vê demê da milletên (nation) modern pêknehatıbûn, dı nav hevda dıman. Peyva İnan, ji peyva Ari hatiye pêkanin. Dı nav salan da ARİ-ARYA-ERON-İRAN bi vi tehri hatiye guhırandın. Paşê imparatoriya Farisî ev navê nişana hebûna pır gelên İnan anıye kırı ye navê dewleta xwe. Bi rastî gotına İrani nişana çand, hebûn û qewmê hemû gelên iranêye.

Zımanên koma İranê me jor ji got, nav xwe da pır nêziki hevın û ji aliyê dın dı nav guruba zımanên İndo-Ewrûpi da cih dıgrın. Koma zımanên İranê dı nav xwe da lı ser du beşan parevedıbin; Zımanên İraniye Rojhilatê û Zımanên İraniye Rojavayê. Sinorên vê beş-

kırinê ji "DEŞTA KEVIRE" û iro lî İraniê da navê erdekiye. Nêzikbû na zımanên İrani, lî jêr ji, çawa xuya dibe gelekî berbiçave ;

Bî İraniya kevn	Taciki	Kurdi	Belucini	Farsi	Afgani
<i>Bratar</i>	<i>Barodar</i>	<i>Bira</i>	<i>Bras</i>	<i>Bradar</i>	<i>Wrot</i>
<i>Gauşa</i>	<i>Guş</i>	<i>Guh</i>	<i>Gûş</i>	<i>Goş</i>	-
<i>Xortan</i>	<i>Xûr</i>	<i>Xwarin</i>	<i>Wartin</i>	<i>Xordan</i>	<i>Xwarel</i>
<i>Mana</i>	<i>Man</i>	<i>Mın</i>	<i>Man</i>	<i>Man</i>	<i>Mı</i>
<i>Dva</i>	<i>Du</i>	<i>Du</i>	<i>Du</i>	<i>Do</i>	<i>Dva</i>

Hinc hêzên kevneperest, berdevkên kolonyalistan û "zaneyên" virek vê nêzikbûna navbera kurdi û farisi da didin ber çavên xwe û dibêjin zımanekî bî navê kurdi tune ye, ew bî xwe beşeke zımanê farisiye. Ew, vê cinarti û nezîkaya navbera zımanan istismar dikin û bî taybetî lî Kurdîstana Tirkîyê hebûna zımanê kurdi inkar dikin û mêjûyan dişon.

Lî jêr, me nêzikayî û cinartiya dî navbera zımanên Slavi da nişan daye û bî hezaran gîlî-gotî pîr nêzîkî hevî. Kesek iro dî kare bêje na ev yek nabe zımanê ūrîsî û zımanê Bulgari pîr hev çûye, wek hevî, ev zımanan du zımanê cuda ninî, zımanê Bulgari tune ye, ew bî xwe hema rûsiye. Ev baweriyên pûç, faş û xelet iro bûye bingehên idolojîya bûrjuvazîya Tirk, misal ;

Rusi	Bulgari	Çeki	Lehistani	Xırvati	Mena wê
<i>Gorot</i>	<i>Grat</i>	<i>Hrat</i>	<i>Gorot</i>	<i>Grat</i>	<i>Bajar</i>
<i>Golava</i>	<i>Glava</i>	<i>Hlavo</i>	<i>Glawu</i>	<i>Glava</i>	<i>Ser</i>
<i>Son</i>	<i>Sın</i>	<i>Sen</i>	<i>Sen</i>	<i>San</i>	<i>Xew</i>

Hemû ev misalên jorin nişani me didin ku, peywendî û cinartiya navbera zımanê kurdi û İndo-Ewrûpî pîr xurtî. Jî ber vê yekê jî, zımanê Erebi û Tirkî bî zımanê kurdi va tu peywendiyên wane bingehî dî warê gramatikê da tunî. Tenê dan û standîna hîrî gotînan dî navbera zımanê kurdi û van zımanan da heye, eva yek ne cinartiya navbera zımanan, tenê tesîra kontaktên zımanan lî ser hev, nişani me dide. Her çiqas dî navbera zımanên İndo-Ewrûpî û bî taybetî dî navbera kurdi û farisi da nêzikayîke mezî hebe jî, disa zımanê kurdi bî serê xwe xudanê gramatik û defîneke gotînan. Jî ber vê yekê jî, dema mirov avahiya zımanan hemberî hev dîke, pêvîste cinartiya navbera wan û kontaktên navbera wan jî hev cuda bîke.

PÊŞKETINA KURDOLOJİYÊ

Lı Akademiya Ermenistanê

(*Duh – İro – Sıbê*)

TOSINÊ REŞÎT

Pêştaçûyina Kurdzaniyê (Kurdoloji) lı Ermenistana Sovyet tış teki text û bext nine. Beri gışki edetên kurdzaniyê lı Ermenistanê, jı sedsaliya navin tê. Dirokênûsê Ermeni, jı sedsaliya navin vır da, dı nav destnıvisarên xwe da lı ser kurdan pır dokumentên hêja, jı mera hiştine, jı vana yek, lı ser zargotına (folklor) kur dane ku dı sala 1711'an da hatiye nıvisandin. Ev dokumenta bı tı-pên Ermeni, nıha lı Muza Desnıvisaran da tê parastınê. Niveke sed saliya 19'an da nıviskar û ronakbirê navdar X. Abovyan çend gotarê (nıvisarê) etnografyê, bı nımûnên folklorı kurdan va tevayı, bı zımanê almanı û úrisi çap kırıye.

Lê, bı rastı kurdzani, lı Ermenistanê paşı şorişa mezin-şorişa Oktobrê derkete ser rêke fireh, jı ber ku, ew sazûman, hukmetê karker û gundiyan bû. Eva cara yekemin bû ku, hukmet bı dewleti lı ser pırsên dirok (tarix, mêju), edebiyat, zıman, netewenasi (etnografya) û çanda gelê Kurd sekını û berbiri van pırsan bû.

Paşı sala 1930'an, êdi Heciyê Cındi, Eminê Evdal û Wezirê Nardiri, dest pê dıkin, bı hogırên Ermeni va lı ser pırsa lêgerına kurdzaniyê kar dıkin. Havına sala 1934'an da lı Erivanê Kongra Kurdzaniyê, cara pêşin berev dıbe. Bı vi tehri, êdi Kurdzaniyê lı Ermenistanê dest pê kır, pêşta çû.

Lê pêştaçûyina kurdzaniyê lı Ermenistanê, dı sala 1958'an da gihişte dereceke bilınd. Jı ber ku, beşa rohilatzaniyê bû 4 koman û jı wana yek jı sazûna kurdzaniyê bû. Serokê wê komê zaneyê folklorê Prof. Heciyê Cındi bû.

Sala 1971'an da tehrê révabırına karên kurdzaniyê dıguhıre û kurdzani dıbe beşeke ser bı xwe, dı nav Akademiya Ermenistanêye Zanistan da cih dıgre, dıbe pareke cihê. Nıha dı vê parê da 10 za neyên kurdzaniyê kar dıkin, 2 doktor-profesor, 4 endamên zaniyarıyê û 4 zaneyê nûgihişti.

Raste, dı vê parê da pırsên kurdzaniyê jı heralı va tên veko landın, lê bêtır guhdari lı ser diroka kurdan berev bûye. Van demên nêzik, rê têra tê ditınê weki hın jı lı ser vê pırsê bê sekandın, bı taybeti lı ser sedsaliyên navin. Jı ber ku, dı vê demê da gelek pırsên diroka Kurdıstanê dı nav tariyê da maye.

Dı nav para (beş) kurdzaniyê da, bı taybeti karên Prof. Heciyê Cındi pır alikariya pêştaçûyina kurdzaniyê kırıye û dı vê rê da keda wi gelek derbaz bûye. Wi, dı warê berevkırın û lêgerına folklorı kurdi da, kareki mezin kırıye û hê jı dıke. Çawa tê zanın bı destê Heciyê Cındi, dı nav gelek salan da 4 berevokên ser-pêhatiyên (çirok) kurdi hatine çapkırın û cıldê 5'an jı, dı çapxa nêdaye. Jı aliyê dın wi nêzkaya 40000 metelokên kurdi berevkırınê jı bo çapê. Ew nıha jı ferhenga Kurdi-Ermeni amade dıke.

Serokê para kurdzaniyê niha Şekroyê Xudo'ye. Ew doktorê diroka kurdiye, ev bist sali zêdetire ew bi pîrsa tevgera gelê kurd va mijûl dibe, bi taybeti li ser rewşa diroka Kurdên Iraqê. Ser van pîrsan ewi 2 pirtûkên hêja nivisiye û çap kiriye. Yek ji vana, di sala 1965' an da çap bûye û navê wê "Tevgera Kurdaye Netewî-Azadiyê li Iraqê Paşî Şerê Cihanêyi Duwemin"e. Pirtûka dudan bi zî manê rûsi hatiye weşandin, ev pirtûka bi navê "problema Xwemuxtarîya Kurdaye Netewî li Komara Iraqê (1958-1970)". Sala tê ji, di sa lêgerineke wi li ser rewşa tevgera gelê Kurd li Iraqê wê çap bibe.

Niha, Şekroyê Xudo guhdarîke mezin dide ser ideolojiya (bir - baweri) tevgerên kurdan li herçar beşên Kurdistanê. Nava vana salên derbazbûyî da, Şekroyê Xudo, wusan ji gelek gotarên zanîyarî li ser pîrsên dirokê çapkirine. Di sa ew li gelek kongrên rojhilatnas yê da beşdar bûye.

Gelek salan seroktiya para kurdzaniyê endamê zanê dirokê Xalîl Çetoev kiriye. Xalîl Çetoev bi taybeti, ji bo ronikîrana diroka Kurdên Ermenistanê karekî mezin kiriye. Di sala 1965'an da pirtûka wî ya pêşîn bi navê "Kurdên Ermenistanê Sovyetê" bi zîmanê û risi çap bû. Di sala 1970'an da ji, pirtûka wiye duwemin bi navê "Tevbûna Kurdên Sovyet li Cenga Niştîmanêye Mezin" çap dibe. Xalîl Çetoev, ji aliyê din çend gotarên hêja ji, li ser kurdên ku di nav Şoreşa Oktobê û şerê bajarvaniyê da cih girtine, nivisiye. Niha ewi nivisareke mezin li ser "Pevgirêdanên Kurdan û Êrîsa Bi Dirokî" amadekiriye, ji bo çapkirinê.

Zaneyê dirokê Karlanê Çaçan, di despêkê da, karekî zanîstî li ser pevgerêdana diroka kurdan û ermenîyan pêk ani. Di sala 1965'an da nivisareke wi, bi navê "Ji Diroka Dostanetiya Gelên Kurd û Ermeni" bi zîmanê ermenî hat weşandin. Ev pirtûk bi hînek zêdekîrînan û tamkîrînan, di sala 1977'an da bi zîmanê kurdi çap bû. Di sa, di sala 1980'an da legerina wiye nû çap dibe. Ev lêgerina bi navê "Kovar û Rojnemên Ermenîyan li Ser Kurdan" derket. Di navbera salên 1850-1920'an da, li ser kurdan, di nav kovar û rojnemên Ermenîyan da çî hatinê nivisandin, Karlanê Çaçan hemû ev tiştina be-revkîrîne û di nav vê biblografîya hêja da rêzkîrîne. Ev lêgerina bi zîmanê ermenî û Êrîsi bi du zîmanan va çap bû. Karlanê Çaçan niha ji, pevgerêdanên kurdan û ermenîyan di warê çandî da, li ser vê pîrsê dixebite.

Zaneyê karên dirokê Celilê Celil, ev gelek sale, li ser rewşa kurdên dema dewleta Osmanîyan, dixebite. Di sala 1966'an da pirtûka Celilê Celil bi sernivîsara "Şoreşa (serhîldan) Kurdan ya Salâ 1880'an", pirtûka dudan, bi navê "Kurdên Împeratoriya Osmanîyan Niveke Sedsaliya 19'aye Pêşîn da" li Ermenistanê çap bû.

Celilê Celil, wusan ji zargotîna (folklor) Kurdi berev dîke û dide çapê. Ew niha li ser pîrsa ol û parastîna kurdên Êzîdî kar dîke.

Zîmanzan Maksîmê Xemo, di beşa kurdzaniyê da, wek filologekî kurd dixebite. Wi lîkolîneke Zaravayê hêla Badînan weşand. Peyra ewi destpêkîr, li ser hevbendiyên (tehrê gotînan) zîmanê kurdi karên xwe kûr kir û sala 1979'an da ferhengeke kurdi-rûsî amade kir. Ew niha ji li ser binaxa van hevbendîyan û ronikîrana wan dixebite.

Memoyê Xalit pêşekzanê netewenasîyêye (etnografya) heta niha ewi çend gotar li ser çanda kurdi çapkirine, bi taybeti li ser xweyikirina heywanan da. Niha ew li ser pîrsên ededên zewacê û pevgirêdanên (peywendî, kontak) berî zewacê dixebite.

Elîxanê Tahar li ser destana "Mem û Zîn" kar dike. Ew bi taybeti bêcerkîrîna (veçêkîrîna) "Mem û Zîn" a klasîk û şaxên vê destanê yê folklorîk va mijûl dike.

Hevkarekî para kurdzaniyê ji Garnîk Asatryan ji li ser tema "Meniyê Hîn Gotinên Kurdîye Sosyali bi Hemberîhevkîrîna Zîmanên Îranêye Mayîn va" kar dike.

Para kurdzaniyê dixwaze bi taybeti bi diroka kurdîye sedsalîya navîn va mijûl bike, ji ber ku, ev diroka gelê kurd iro kêma hatiye vekolandinê. Ji bo ronîkirina wan pîrsan hevkarê parê Arşak Poladyan ji çavkaniyên (dokumend) ereban - di sedsalîyên 7-14' an da, li ser kurdan melûmetîyan hildîçîne. Ev karana, wê di paşarojê da bi zîmanê ûrîsî, bi çend cildan va çap bike. Karekî vî tehrîkê di mêjva, ji aliyê kurdzanên Leningradê da tê ajotîn. Kurdzan Ewênîya Vasilêva ji çavkaniyên farsî gelek melûmetî li ser kurdan hilçandiye û çap kirine.

Serokê para kurdzaniyê, çawa dide kîşê, wekî wê zûtîrekê zanekî hildin li ser kar. Ew zaneyê, çavkaniyên Ermenîyan di sedsalîyên navîn da ji hev derîne û li ser kurdan wê melûmetîyan berev bike, hilçîne.

Berevkîrîna melûmetîyên li ser Kurdîstanê, li ser gelê kurd bi zîmanên erebî, farîsî û ermenî wê gelek pîrsên tari, ronî-zelal bike, wê diroka gelê kurd, di sedsalîyên navîn da, bi tehrîkî rast û tam raberî xwendevanan, pêşekzanan bike.

Niha para kurdzaniyê li Ermenîstanê berevokê nezin amedekîriye bona çapkirinê. Di nav vê berevokê da ne tenê gotarên zaneyên Ermenîstanê wusan ji gotarên pêşekzanên Moskoyê û Leningradê wê têda çap bibin.

Iro li Ermenîstanê, xên ji, karên di çarçeva para kurdzaniyê da dajon, çawa em dibînin, hîn kar ji hene di zanîngê û cihên din da ji dajon. Li van şûnan ji bi destê çend kurdzanan karên hêja hene, wek Nûra Cewarî (pêşekzana mûzîkê), Şerefê Eşîr (dîrokvana), Kinyaz İbrahim (filolog), Çerkezê Reş (edebiyatzan)...

Iro gava em lê dînhêrîna hîne hêz li seranser Kurdîstanê li zîman, edebiyat û çanda gelê Kurd hatîne xezevê. Disa gava "zaneyê" netewê serdest ji bona karê xwedîyê xwe dirok û çanda gelê Kurd kaji-vaji dikin, feş dikin, kurdzanê Ermenîstana Sovyet bi serbîlîndî barê kurdzaniyê bi girani dane ser milê xwe û bi dil, bi can xîzmeta gelê me dikin.

DI KOVAREKE KURDISTANA IRAQÊ DA

KEMAL BURKAY

Dı nav rûpelên kovara "Nûserani Kurdistan" da bı destê nivîskar Xelil Dihokî lêkolîneke bı navê "Şorişvan û hozanê Kurd-Kemal Burkay" hat weşandin. Kovara "Nûserani Kurdistan" organa Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê ye. Çiqas nivîskarê gurûp û partiyên Kurdistanê Iraq hene, hemû endamê vê rêxistinêne. Hemû ev nivîskarên şerê çek û qelemê xîstine yek, iro lı diji zîlm, zordesti, koledari û jı bo Kurdistanêke azad-demokratik bı mêrxasî şer dîkin. Bê guman, ew, xebateke hêja û giranbuha dı warê çand, huner û edebiyata kurdi da pêk tînin. Her wusan jı, pêviste bêjım "Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê" dı sala 1973'an da hatiye damezrandın. Ango endamê vê rêxistinê lı nav çar azadkırî da dîminın û karên xwe

dajon. Kovar bı kurdi û erebi bı du zımanan va derdikeve.

Dı hejmarê 6'an da, çawa em dibînin dı rûpelên dudan da, lı ser Kemal Burkay benêke dirêj, jı aliye nivîskar Xelil Dihokî da hatiye nivîsandın. Ew dı lêkolina xwa da dır û dirêj lı ser jiyina Kemal Burkay dîsekine, paşê ewi naveroka helbestên Kemal Burkay vekolandiye, ew jı hev deranîne û ser helbestên Kemal Burkay tîştine pır xweşik nivîsiye. Disa dı vê hejmarê da, helbesta Kemal Burkay bı navê "Şorişvanê Burjuvaziya Bıçûk" jı hatiye weşandin. Ev hejmarê kovara "Yekîtiya Nûserani Kurdistan" isal der çû. Çawa em lê dînin, dı vê hejmarê da, gelek çirok serpêhati, helbest, vekolin û nivîsarên rındık, xweşik jı hatine weşandin.

MAHMUT

filmek:

"EM KURDIN,,

Bı destê rejisorê Gurcistanêyi nav û deng Giya Çûbabriya filmeki dokumantal lı ser rewşa Kurdên Gurcistanê hat amadekırın. Ev filma, bı navê "EM KURDIN" wusan jı lı Leningradê tevi Festivala Kinodukumenal bûye. Dı film da, dır û dirêj lı ser pêşkettın, serfirazi û dîlşahiya Kurdên Sovyet hatiye sekinandin.



Giya Çûbabriya

KEMNADE

Şahiya (Festival) bî navê KEMNADE isal lî Elmanya Rojava lî nêziki bajarê Bochumê hat çêkirin. Ev şahiya navnetewî (internasyonal) du sala carê jî aliyê dêra (Klisa) bajêr da pêk tê.

Isal lî nêzkaya 70 rêxistin, kom û gurûp tevi vê şahiye bûn. Çawa tê zanin dî vê şahiye da her gel (Xelq) çand, folklor, muzik û xwarin-vexwarinên xwe jî gelên din ra dide nas-kirin. Çawa tê zanin iro lî Elmanya Federal "Kultureke Biyanîyan" bejn dî

de û wusan tê navkirin.

Şahiya isalin 3 rojan ajot, vê carê, wek şahiye salên buhuri folklor û komên muzika kurdan jî, dî vê cejna mezin da beşdar bûn. Dî bername (program) çandi da bi destê Federasyona Komelên Karkerên Kurdistan - KOMKAR, gelek perçe û numeyên çanda kurdi hatin pêşkêşkirin. Jî bo da nasina kurdan, dî şahiye da, lî ser kurdan informasyon hat dayin û xwarin-vexwarinên Kurdistanê dî şahiye da hatin amadekirin.

NIVİSKAR

BAXÇOYÊ İSKO

70 SALIYA XWE TIJÎ KIR

Dî nav van rojan da 70 saliya bûyina mamoste, ronakbir û nivîskarê hêja, Baxçoyê İsko tamam bû. Baxçoyê İsko niha lî Komara (cumhuriyet) Gurcistanê dimine û karên xwe lî wir da jo. Wî dî nav gelek salan da, jî bî pêştabîrîna zîman, çand û edebiyata Kurdan bêwestan kar kiriye.


Baxçoyê İsko endamê Yekitiya Nivîskarên Gurcistanêye. Çawate zaninli Gurcistanê dî nav vê rêxistinê da ko meke nivîskarên kurd heyê. Jî van nivîskarên kurd lî Gurcistanê 5 kes jî, endamê Yekitiya Nivîskarên Sovyetêne.

Baxçoyê İsko, jî der karên dersdayinê, wusan jî lî ser danaskirîna kurdan lî Sovyetistanê pîr karên hêja kirine. Wî pirtûkeke bî navê "KURDÊN PIŞKAVKAZÊ" bî zîmanê Gurcî çap kiriye. Jî aliyê din gelek efrandinên wî jî, bî zîmanê Kurdî û Rûsî

hatine weşandin. Demekê şûnda jî, be revoka helbestên wî, wê bî çapkîrîne. Dîsa efrandinên Baxçoyê İsko, dî nav berevoka bî navê "EZ KILAMA XWE DİST RÊM" da hatine çapkîrîn.

Jî ber tijikîrîna 70 saliya bûyina vî lawê Kurd, 2 civinên pirozba vî hatin saz kirin. Yek jî vana lî Gurcistanê û yek jî lî Ermenistanê derbaz bû. Dî roja 17-6-1983'an da dî "MALA NIVİSKARÊN ERMENİSTANÊ" da lî ser bûyina helbestvanê Kurd Baxçoyê İsko şahik amade bû. Dî vê êvarê da Prof. HEÇIYÊ CINDÎ lî ser kar û barên Baxçoyê İsko, jiyina wî, baweriyên wî gotarek xwend.

Jî ber 70 saliya bûyina ronakbir û nivîskar Baxçoyê İsko, kovara ROJA NÛ, jî wî ra xweşî, gavê fireh dixwa ze û wî piroz dike.



Danasina KURDAN

Û

MAHMUT BAKSI


Mahmut Baksi rojnemevan û niviskareki kurde. Ew, bi xwe niha li Swêdê dimine. Baksi, di sala 1944 da, ji diya xwe bûye û zarokiya xwe, xortaniya xwe li Kurdistanê derbaz kiriye.

Di sala 1971'an da, dema cûntaya faşist li Tirkîyê hukim xîste bîn destê xwe, ew ji ber neçariyê derdikeve derva û diçe Elmanya Federal, sa lekê şûnda ji, ew diçe Swêd li wir

dimine. Ew niha, di rojnema Aftonbla detê da kar dike û gelek rojnemêndin da ji bendên wi, nivisarên wi derdikevin.

Heta niha Mahmut Baksi bi zimanê kurdi, swêdi û tirkî gelek efrandin nivisiye. Ji ber van karên xwe, ew isal bû endamê Yekitiya Niviskarên Cihanê (PENNKLUBB)

- Di nav 3 pirtûkên xwendinê da, bi zimanê swêdi, li ser kurdan yek nivisarên Mahmut Baksi ji cih girtine. Redaksiyona Roja Nû li ser vi kari lêkolinek amadekir û wê pêşkêşî xwendevanan dike.



Iro bi sedan mirov ji gelek welatên cuda hatine û li Swêd diminin. Bo vê yekê ji carina Swêdê bi nav dakin "Welatê Biyanîyan". Di navbera van hemû milletan da, iro, çawa em dibînin bi hezaran kontak pêk tên, ew nasiya xwe didin hev, dixwazin hev fem bikin û dixwazin hevdu hin ji zê tîr nas bikin, li ser hev tiştan bizanibin. Tu dinhêri carina hin mirovên biyanî ji me dipirsîn: "Bi rasti em li ser kurdan kêmtîştan zanin, hûn dikarin hin ji zê tîr li ser kurdan me ronî bikin?" Bi rasti ji, iro

li cihanê kurd, hebûna wi û çanda gel bi tehreki xweş nayê zanin. Sedemên vê serêşiyê çawa tê xuyanê du faktorin. Yek heta niha karên informatîk û danasinê bi destê rêxistin, komele û ronakbirên kurd da baş nehatiye cih. Ya dudu ji, hêzên kolonyalist li ser kurdan tiştên faş, xelet û nebaş gihandine biyanîyan. Van hêzên kevneperest kumê Xelo danine serê Çelo, yê Çelo danine serê Xelo û çanda gel kaji-vaji kirine û bi tehreki din va dane naskirin.

Karê iro li pêşiya me sekiniye, pêwîste em kirasê li ser rûye rasti-

yê bıkşının, rûreşiya dijmin nişan - bîdın û kurdan hin ji baştir li biya niyan bîdın naskirin.

Dî vi wari da Mahmut Baksi kareki berbiçav û kêrhati pêkaniye. Jî van karan yek ji, dî nav 3 pirtûkên xwendinê da cihgirtina temaya kurdane. Dî nav van hersê pirtûkan da beşên (keri) li ser kurdan bî destê Mahmut Baksi da hatine amadekirin.

Ev pirtûkê jî bo swêdiyan û xwendekarên biyani hatine çapkirin û tiraja wan (hejmara çapê) jî pîr bîlinde, ew bî swêdi hatine nivisandin û efrandinên gelek niviskarên welatên cuda têda çapbûne.

Armanca çapkirina van pirtûkan ewe ku, şagirt û xwendekarên dibistanan xên jî dersan, wusan jî nasiya xwe bîdın edebiyat û çanda cihanê. Ev pirtûkên xwendinê, jî bo alikariya zarokan û kesên ghişti dîke û destê wan da, dibe materiyal. Wezirê Karên Perwerdegarîyê, çawa dî despêka pirtûkan da jî tê xuyanê, hemû ev pirtûkêna xweş ditiye û pêşneyarî şagirtan kiriye.

Pirtûka pêşin, dî sala 1982'an çap bûye "Avahiya Zimin-Pirtûka xwendinê" ye (Språkbygget-Läsebok). Dî rûpelê 158'an da, nivisareke bî navê "Rêwitiya Berbi Swêdê" (Resan till Sverige) heye. Têda serpêhatiya keçe ke kurd- ZOZAN cih girtiye. Ev pirtûka bî taybetî jî bo şagirtên xwendinêna pêşin hatiye amadekirin.

Pirtûka duvemin ya bî navê "Swêdi jî bo kesên ghişti" (Dialog Vukensvenska) disa dî sala 1982'an da

bî swêdi çap bû. Dî rûpelê 61'an da li ser niviskar Mahmut Baksi bî kurtî hatiye seknandin. Paşê serpêhatîke bî navê PERO cih girtiye. Dî vê serpêhatiyê da rewşa jineke (pirek) kurd tê vekolandin. Dî vê serpêhatiyê da rewşa ku jinên kurd têda dijî ew hatiye nîtirandin. Ev pirtûka jî, jî bo kesên xwendegehên navin da dixwinin û jî bo kesên salbîhuri hatîye amadekirin.

Pirtûka sêwemin jî, dî sala 1983'an da bî navê "Zimanê Zelal" (Klar språk) hat çapkirin. Ev pirtûka jî, bî taybetî jî bo xort-keçên ku diçine lîsê (Gymnasium) hatiye amadekirin. Dî vê pirtûkê da jî, dî nav rûpelên 117-126'an da Mahmut Baksi serpêhatîke bî navê "Zanin Hewcedari West û Xwestinêye" (Kunskap kräver tid och kärlek). nivisiye, dî vê beşê da niviskar vê carê li ser zarotiya xwe, salên xwendinê û zordestiyên li ser hinbûna zimanê kurdi dîsekine.

Ev hersê pirtûkên xwendinê, iro li Swêdê jî aliyê bî hezaran zarok, keçe-xort û kesên salbîhuri da tîndî xwendin, ne tenê kurd, swêdi, yuwnanî, polonî, jî latin Emerikayê bigre heta Efriqaya reş gelek kes bî vî tehrî, bî hebûna kurdan û çanda gelê kurd ra agahdar dibe. Jî aliyê din, li tenîştê bî sedan niviskarên cihanê, navê niviskareki kurd û cihgirtîna çanda kurdi, dî nav van pirtûkan da kareki pîr kêrhati û serfiraze.

“Ez RODÎ’me,,

Ez niha lî bajareki mezin dijim. Ew bî hezaran kilometır jî Kurdîstanê dûre. Ez hin baş nîzanîm ez kîme, zîmanê mîn jî hin baş nafîrtîle û hêstîrên mîn jî hin lî ser welatê bav û kalan nerîjyane. Lê belê roj bî roj ez pîr tîştan fêr dîbîm. Kurdîyatîya mîn dî hundur dilê mîn tê birajtîn.

Ez bala xwe dîdîm bavê xwe, ew çawa yek çaran dîxeyîde û lingên xwe lî erdê dîxe, dema ew hin tîştan jî radyo dîbihîse û rojneman dîxwîne. Ez dîbînim çawa hêstîr, jî çavên dayka mîn dîbarîn, dema name jî welat dîg-hên destê me. Lî welatekî dûr wek Australya jî, ez roj bî roj fêr dîbîm ku ez kurdîm. Rojek wê bê, ez bî hezaran keç û lawên wek mîn wê mezin bîbîn û wê baş hevalan û dijminan jî hev derînin.

Navê mîn RODÎ'ye. Mîn ro lî welatekî jî Kurdîstanê dûr dît, jî ber ku dê-bavê mîn şevereşeke tari da re vin. İro lî Kurdîstanê tune, lê Rodî



yên Kurdîstanê lî her çar hêlên cihanê mezin dîbîn, Kurd û Kurdîstan dî dilên wan da jî dijî. Dîjîm bî-xwaze-nexwaze emê mezin bîbîn.

R O D Î
Australya

WERE

Genîm zer bû lî deştê
berf nema lî serê çîyan
mêzer perîtî
nema dêre
neferê malê gîşk tazi man, were
Şîrê memîkan qediya
mîçîqî av lî kaniyan da
nîfta malê xîlaskîrîn şêlankaran
sal jî dibore ser salê
bihna mîn teng bû, were
disa pencera ber derîyan da
dîpê mî rêya te
şûrê xwe tûj kîriye dijîm
lî ser hêlûna me ya ezîz û kevn
erîşê wan berdewame
zarok bî zîmanbûn

qîz û bûk çav lî rêne
pîrani rabûne ser piyan
tirê xwe
ber bî ewrê reş girtîne
hêviya tene
Were
ser serê mîn
nav dilê mîn da
reş-tariyê belavbîke
veqetîne cendek lî sêrî
bîrijîne jarê maran
bîla gez nekî tu kesi êdî
bese bese !
bîla were bî destê te
AZADÎ.

VAZGAL BEYAZÎDÎ

BEREVKIRINA ÇİROKÊN GEL

Û SÊ PIRTÛKÊN M.E. BOZARSLAN

ŞEMDÍN

Bı destê niviskarê Kurd M.E. Bozarslan heta niha 4 pirtûkê çirok û serpêhatiyên (hikayet) li Swedê hatin nivisandin. Ji vana, pirtûkên "Mir Zoro", "Gurê Bîlurvan" û "Kêz Xatûn", çirokan pêk hatiye. Bı taybetî mêrxasên van çirokan, ne mirovin, ew heywanin. Bo vê yekê mirovdikare van çirokan "Qelibotk" û "Fabil" nav bike. Niviskar bı xwe ji navên van efrandinan daniye "Meselokên Lawîran". Pirtûka çaremin "Meyro"ji, gelek serpêhatiyên nûjen (modern) û edebî têda hene. Ev pirtûka cara pêşin di sala 1979'an da li Îs tanbolê çap bû û paşê ji hate qedexekirin.

Çawa, Bozarslan ji, di pêşgotina "Mir Zoro" da diyar dîke, we ki ev çirokana di nav gelê me da pır belav bûne, tên gotin û beşê ke edebiyata me pêk tinin. Her çiqas, ev çirokana jı bo zarokan pır kêrhatî bin ji, mirovên salbuhurî jı van çirokan bı xweşî dıkarin bixwînin. Ev despêka M.E. Bozarslan jı bo pêşketina "Edebiyata Zarokan" bı rasti gaveke nû û kêrhatîye.

Di vê nivisara xwe da, em nafikirin ku, di warê zıman, huner, tehr û edebiyatê da li ser hêjayiya wan bisekinin, wan çirokana yek-yek şirovekin. Di nivisandina van çirokan da, tiştê heye bala me dîkşine ser xwe, jı balkişandinê ji pêştatır me şa dîke, ew ji, berevkirin û weşandina van çirokên folklorikın. Ji ber ku, ev çirokên heta niha nenivisandi, jı zar-zıman, bı destê M.E. Bozarslan derbasî li ser kaxêz bûn. M.E. Bozarslan bı zımaneki xweş û delal ew nivisîne, dema ew nivisîne psikolojiya (ruhiyêt) zarokan jı daye ber çavê xwe, zarok çı hêz dıkin û çı hez nakin ev yeka baş jı hev deraniye, di çarçeveke edebî da, wı, ev çirokana nivisîne.

Di pirtûka pêşin, "Mir Zoro" da, nivisandina vi helbestê hêsa û piçûk, nêzikaya navbera niviskar û ruhiyeta zarokan baş nişani me dide.

"zebeşe
Dendikreşe
Xwarına wı xweşe
Kalo newxeşe
Pirê bêheşe
Lawık keleşe
Keçık çavreşe
Karık hebeşe"

Disa di despêka her çirokê da, niviskar formên çirokbêjiya kurdî û rewşa politik li welat gihandiye hev, zarok jı tirs-xofa zordestan dîr xıstiye, weki zarok bı xweşî çirokên xwe guhdar bın, wek:

"Hebû tunebû carek jı caran, rehme li dê û bavên guhdaran, xên ji cendırme û tehsildaran"

Çawa tê zanin, di nav hemû gelên rohilatê da, edebiyata nivisandi zêde bı hêz nine. Bêtir helbest pêşta çûye. Wek roman, ser-

pêhati, pirtûkên tiyatroyê û her weki dîn, zêda nehatine efrandin. Li kurdistanê ji, ev paştamayin dajo.

Bêşik, sedemên vê rewşa xirab, ji bîndestiyê netewî û nerserbestiyê gelê me tîn. Zevtkirina erdê welatê me, zordestiyên li ser çanda me û qedexekirina zîmanê kurdi gelek astengên bilind li ber me danine. Ji ber vê yekê, çawa rewşa aborî, civakî û wusan ji rewşa çandî zêde pêşta neçûye. Zordestî û qedexeyên dijmin nehiştine û nahêlin ji, weki çanda kurdi bi hêza xwe va (oton dinamizm) pêşta here, şax vede û xurt bibe. Gelê me, tu wext ew azadî neditiye, weki efrandinên nivisandî peyda bike.

Dî nav gelê me da, gelek çirok, serpêhati, meselok, metele, pêkenin, lawîk, delorin, qewlik, galî-gotinên xweşik û gelek efrandinên ji hev bedewtir hene, ku di civatan da, di malan da, di şevên payizan di odên gundan da, di rêwiti, paletî û di nav zîbaran da, li ser derguşan, di dilan-şahiyan da, li ser tevne, li bêriyê, bi kurtî di her warê jiyînê da tîn gotin.

Dijminên gelê me tu car serfiraz nebûne, ku çand, zîman û folklorê me ji ortê rakin. Çimki efrandarê van hebûnên me, gel bi xweye. Gele, yê ku çanda me av dide, diparêze û xweş dike. Ev efrandinên çand û folklorê bi salan diguharin, dewlemend dibin, nexşexemlên nû digrin û hinek ji carina wunda dibin. Lê, kiye ew van tiştan derbazî ser kaxîz dike, kiye ew, efrandariya gel dixê nav rûpelên pirtûkan, ji tariyê, ji wundabûnê xelas dike û kiye, wan ronî dike? Bê guman, kesên ronakbîr, şareza û zane van karan hildidin ser milên xwe. Di van rojên teng û dijwar da, ew dibin berbersiyar û rê nişani gel didin. ■

DI BALE Û OPERAYÊ DA



DU ARTÎSTÊN KURD



Natêla û Vladimîrê Qasîm du xwişk û birane. Her du lawên Kurd ji, li Tîblîsê hatin dinyayê. Ew paşê çûn li Leningradê ciwar bûn.

Wext derbaz dibe, Natêla dikeve teatra Operayê li Tîblîsê. Ew li wir ji kursên balayê da beşdar dibe. Vladimîr ji dîçe li Leningradê, di teatra bi navê CM. Kirav da dixebite. Paşî van karana, ev du artistên jêhati, di warê opera û baleyê da gelek pêşta dikevin.

Sala par koma wan dîçe bajarê Tîblîsê, listîka Çaykovski bi navê "Gola Qubeqaza" nişan didin. Xên ji vê xebatê, wan gelek listikên bedewiyê raberî baldar û guhdarên xwe kirine.

Paşî demekê Natêla û Vladimîrê Qasîm wê herin tevi leceke internasyonali bin. Ev şahiyê li bajarê Bulgar-Varna'yê çê bibe.

Li ser van herdu artistên Kurd, bi destê rojnemovan Têmurê Xelîl bendeke hîn ji dirêj, di nav rûpelên rojnema "RÎYA TEZE" da hat weşandin. (8-6-1983)

NORDENS FOLKHÖGSKOLA BISKOPS-ARNÖ

O C H

S V E R I G E S F Ö R F A T T A R F Ö R B U N D

I S A M V E R K A N

Qurseke Kurdi

Lı Swêdê, jı bo niviskaran, mamos-
tan, pedagogên malbatan û kesên ku
dixwazın lı ser zıman û wêja kurdi
bixebitın, qurseke kurdi hat saz kirin
Kurdên lı Danimarqa û Norweçê jı têne
vexwandın ku dı vê qursê da beşdar
bın.

Qurs wê jı sê gavan pêkbê :

Gava 1'em - dı navbera 7-13'ê Tebaxê
1983 (Qursa bingehi)

Gava 2'em - Tirmeh 1984 (Qursa kûrane)

Gava 3'em - Tebax 1984 "

NAVEROKA QURSÊ: 1-Zımanê Kurdi

2-Helbestvaniya Kurdi
Wêja Kurdi

3-Praktika Nivisînê.

Mamosta û serwêrên qursê nivis-



kar M. Emin Bozarslan û Ferhad Şakeli
ne. Xên jı wan, çend kesên din jı wê
jı Yekitiya Niviskarên Swêd, jı Dıbis
tana Gel ya Bılind û jı Daira Çandî
ya Dewletê (Kulturråd) jı ,tevkariya
vê qursê bıkın.

DILÊ MIN LI DILÊ TE DIGERE

BIHARA REŞ

Destên mın
Lı destên te dıgerın
Lı ku ne destên te ?

Çavên mın
Lı çavên te dıgerın
Lı ku ne çavên te ?

Dilê mın
Lı dile tê dıgere,
Lı ku ye dilê te ?

Mın dıvê
Hembêz bıkim lê !
Rındê! Dilberê !
Zıray bejna te.

Gul geş nebûn isal
Nêrgıs venebûn
Qıvar bı çokekê bılind nebûn
Avi neket lı mêrgan
Serê çıyan nebırıqand
Dar û zadan ber nedan
Bılılın nestıran
Nexwendın kewan
Çıma wısan bû ?
Ev çı bıhar bû KURDISTAN ?

FIRAT CEWERÎ

SYDNEY - 83



Lı jor gurûba zarokên kurd xuya dıke

KURDISTAN
Kurdistan
Folkloric Group

GOVEND

Every anniversary whether social, religious or national is a good reason to initiate a Govend, a Kurdish word referring to the traditional folk dances. Govend takes place in the village yard and attracts hundreds, sometimes thousands of people.

Leaders: Welî Azad, Chahin Baker

Musicians: *Tenbur* — Rifat Kara, Cenkiz Gulbahce,
Emirhan Sulbudak

Drum — E. Mir

Singer: Hasan Siyamed

Komela Kurdê Avusturaliyê, di roja 11-6-1983'an da, li "SYDNEY OPERA HOUSE" da bi programeke hunermen di û çandi va beşdar bû. Komelê, bi gelek karên muzik û folklorê, bala bi hezaran kes kışande ser xwe. Di

vê sahiyê da, ji milletên din ji gelek komên muzik û folklorê cih girtin. Şahi ji aliyê Kurdên Avusturaliyê da, bi serfirazi derbaz bû. Vê cejnê bi tevbûna gelek folklorên biyani va, rengeki internasyonalî stand.

JI NAV WEŞANAN

TARIXA EDEBIYATA KURDI

Pirtûka bi navê "TARIXA EDEBIYATA KURDI" berî mehekê di nav weşanên "ROJA NÛ" da hat çapkirin. Pirtûk, ji aliyê zîmanzan û kurdolog Prof. Qana de Kurdo da hatiye nivisandin. Ev efrandîna heja bi xwe 2 besan ya pêk tê, ev pirtûka besê (çildê) yekemine, besê duwemî jî, paşî cend mehan we bîgehê destê xwendevanan.

Pirtûk bi pêşgotîneke dirêj va dest pê dike. Qanadê Kurdo, di vê pêşgotîna xwe da bi tehrêki rîneh li ser rewşa edebiyata kurdi dişekine. Di nav vê pêşgotîne da cend besên cu da (çihê) here, wek:

- Tarixê lêgerîna Edebiyata Kurdi li nav kurdan da û Rûsistanê da;

- Roja kovar û rojnemên kurdi li Dîroka Edebiyata Kurdi da;

- Melumetiyên Şerefxan Bitlîsî û Evliya Çelebî derheqa şayir û zanyarên kurdan da;

- Lêgerîna Tarixê Edebiyata Kurdi li Iraqê da.

Paşî vê despêka dir-dirêj niviskar Qanadê Kurdo, li ser van helbestvanên jêrin dişekine û wan bi me di-de naskirin: Eli Herîrî, Ehmed Mele Batê, Feqiyê Teyran, Meleyê Cizîrî, Selîm Sulêman, Ehmedê Xanê, Xarîr Bitlîsî, Pertew Begê Hekarî, Şex Xalîd, Siyanûs, Cîgerxwin, Osman Sebîrî, Qadrî Can.

Di besa duwemî da, Qanadê Kurdo li ser helbestvanên ku bi zarawê soranî nivisandîne, li ser wan dişekîne. Bi rastî, ew lêgerîna (lêkolîna) û efrandîna heja kareki pîr giranbîna û delîle.

Bi vi tehrî heja nîha, me di nava "weşanên Roja NÛ" da 7 pirtûkên heja raberî xwendevanan xwe kir.

KULILKÊN KURDISTAN"

Federasyona Komelên Karkerên Kurdistan li Elmanya Federal (KOMKAR), bi navê "Kulilkên Kurdistan" li ser rewşa gelê Kurdistanê û bi taybetî li ser zarokan broşurek belavkir. Ev broşur, bi sê zîmanên ewrûpî-îngilîzî, almanî û norveçî (ji aliyê Komela Karkerên Kurdistanê a Demokratîk) hatiye nivisandin û belavkirin.

NISANI

Berevoka serpêhatiyên niviskar BABAYÊ KELEŞ li zîmanê kurdi li Erivanê hat çapkirin. Di nav berevokê da 14 serpêhatiyên çîhîrtîye. Redaktor û pêşgotîna vê pirtûkê MAMI KÊ SERDAR nivîsîye.

FERHENGA SWÊDÎ-KURDI

Iro bi hezaran Kurd, ji ber neça riyê, belengaziyê û ji ber zordestiyên politîk pêvist mane li derwayî welat dimînin. Ji van kurdan bi hezaran wusan jî li Swêdê dijîn. Ji bo rêvabîrîna kar-bar û jiyîna xwe, ew pêvistin zîmanê Swêdî fêr bibin. Ji ber vê hewcedariyê, eva cara yekemine ku ferhengeke bi SWÊDÎ û Kurdi hat amadekirin. Ferheng, bi taybetî, ji bo kursên zîmanê Swêdî û hêsakîrîna hinbûna wî, pîr kêrî kurdan tê. Ji ber ku, ev ferheng bi zîmanê zîkmakî (dê), peyvokê (kelime, gotîna) Swêdî şîrovedike. Ev ferhenga bi herdu zaravayên kurdi va Kurmancî-Sorani hatiye amadekirin. Ev karê nû, bi destê niviskar REŞO ZILAN' va pêk hatiye. Reşo Zilan, di despêka pirtûkê da, wusan jî, li ser hewcedariya çapkirîna vê ferhengê pêşgotînek nivîsiye. Ji bo çapkirîna ferhengên Kurdi û bi zîmanên biyani ev kara, karekî nû û gaveke pêşe.

COXRAFYA KURDISTAN

Beri çend mehan lî Swêdê bajarê Uppsala, dî destê xwendekar Feridun Danişwar, bî Ingilizi lî ser Coxrafiya Kurdistanê lêgerinek derket. Na vê xabata wi "Contribution TO THE GEOLOGY OF KURDISTAN"e. Dî pirtûka xwe da Feridun Danişwar lî ser hebûnên Kurdistanêye bînerd û sererd dîseki-ne, dewlemendiya wan nişan dîde û vê yekê pîr xarîtên baş va nişan dîde.

KURD Û KURDISTAN

Pirtûka "Kurd û Kurdistan" vê carê ji bî Elmani tê çapkîrîn. Ev pirtûka bi navê "Kurdistan und die Kurden" çawa tê zanin bî destê Gerard Chalian û bî alikariya İsmet Şerif Vanlı, Qasımlı û Kendal cara pêşin lî Frensê hatibû çapkîrîn.

DENGBÊJ KAL BÛBÛ

Beri çend meha pirtûka WEZİRÊ EŞO bî navê "Dengbêj Kal Bûbû" hat weşandin. Dî nav rupelên pirtûkê da deh efrandinên Wezirê Eşo cih girtî-ne.

"HÊVÎ"

Enstituya Kurdi lî Parisê diyarrek girt weki Kovarêke bî navê "HÊVÎ" derse. Kovarê salê 2 caran wê çap bi be û nêzkaya 120-160 rupelî wê bigre. Kovarê bî zaravê kurmançî, soranî û zazakî 3 zaravan va derkeve. Enstituya Kurdi lî Parisê çawa diyar dake, naverokê wê, dî nav çarçeva lî jêr nivisandî, wê pêk bê:

- 1) Heibest (bî kurdi an ji zimanên biyani wêgerandî)
- 2) Çirokên edebî (bî kurdi an ji zimanên biyani wêgerandî)
- 3) Şano (Tiyatro)
- 4) Rexneyên edebî, hunerî hwd.
- 5) Pirsên ziman û gramera Kurdi
- 6) Lêgerinên diroki, aborî
- 7) Nûçeyên çandî û zanistî yê gîştî.

Çawa dî Belevoka ku Enstituya Kurdi derxistîye, lêşê diyar dibe ku, hêjmara HÊVÎ'ya yekem dî nav meha lîbnê da wê bihêjê destê xwendevanan.

KÊZ XATÛN

Pirtûka M. E. BOZARSLAN lî Swêdê bî navê Kêz Xatûn çap bû. Ev pirtûka çirokan, jî bo zarokan hatiye amadekirin. Çawa tê zanin, dî rêzê da berê ji du pirtûkên din bî navê Mir Zoro û Gurê Bilurvan hatibûn weşandin.

RASTNIVISARA KURDI

Lî Moskova, wê carê Zimanxanê Kurd Çerkez Bekarê bî navê "BİNBEN RASTNIVISARA KURDI" weşarke. Zanistî bî Zimanê Rastnivisara lî vê pirtûkê da, weşan jî Ferhengê Rastnivisara Kurdi cih girtîye. Pirtûka wê kava 22 hezar pêçûk dane. Dî nav rupelên pirtûkê da gelek lekistan cih girtîye.

HOKIRINA ZIMANÊ KURDI

Beri çend roja, pirtûkeke bî navê "Hokirina Zimanê Kurdi-1" gihiştê destê me. Jî bo hinbûna zimanê kurdi dî nav kurdên Avustralyê da, çawa tê zanin kareki hêja dajo. (weşanên Radyo, vekirina dibistanan û derxistina gelek materyalan)

Ev pirtûk, jî aliyê Şahin Bekir da hatiye amadekirin. Çawa dî pêşgotina xwe da, niviskar diyar dîke ku, bî taybetî ev materiyal jî bo guhdarên Radyoya Kurdi lî Sydney hatiye nivisandin, weki ew guhdaran hêsatir hîni zimanê kurdi bîbin.

Dî pirtûkê da gelek şikl, sûret û xemlan jî cih girtîye. Dî dawiyê da jî, ferhengêke piçûk bî zimanê kurdi, engilizi, tirkî, elmani û erebî heye.

Jİ UNESCO RA NAMEYEK

İsal lî Stockolmê dî nav weşanên "Dengê KOMAL" da, bî navê "Jî UNESCO'ra Nameyek" pirtûkek hat çapkîrîn. Ev nama jî aliyê niviskar İsmail Beşikçi da hatiye nivisandin. Beşikçi ev nama dî Girtigeha Adapazarê da nî visiye, weki UNESCO'ra rê bîke, lî polêsên tirk dest dane ser vê namê. Beşikçi dî vê nama xwe da, zordestiyên lî ser çand, dirok û zimanê kurdi lî Tirkîyê protesto dîke û wan zordestiyên bî baweriyên Kemal Atatürk va girêdide.

SERFIRAZÎKE NÛ

Lî Swêdê dî nav gelek komên futbolê da, koma SPORA KURDISTANÊ bî listikên xweşik va, dî nivê pêşin da serket û bû lider.




LÎSTIKÊN NIVÊ-PÊŞIN DAWIYÊN WANÊ

Gasemorgs IF - S.Kurdistan	0-2
S.Kurdistan - Condor	1-1
Solhöjden - S.Kurdistan	3-0
Jarfalla AIF - S.Kurdistan	2-3
S.Kurdistan - Malet/Staket	4-0
BİFF - S.Kurdistan	3-4
S.Kurdistan - Syrianska	5-0



LÎSTIKÊN NIVÊ-DUWEMÎN

<u>Roj</u>	<u>Seet</u>	<u>Cih</u>
10-8-83	18.15	Spanga 1 P.2
S.Kurdistan - BİFF		
19-8-83	18.15	Kvarnvallen 2
Malet/Staket - S.Kurdistan		
27-8-83	13.00	Spanga 1 P.2
S.Kurdistan - Jarfalla AIF		
10-9-83	11.00	Spanga 1 P.2
S.Kurdistan - Solhöjden IF		
23-9-83	20.00	Kvarnvalen 2
Syrianska - S.Kurdistan		
30-9-83	18.15	Kvarnvallen 2
Condor - S.Kurdistan		
8-10-83	13.00	Spanga 1 P.2
S.Kurdistan - Gaseborgs IF		



Xaliçeke Kurdi

EZ TE HEZ DIKIM

*Xewna xwe da te dibinim, Xazi disa ez xort bûma Rojê çûyi ez bir tinim
Lı ber konê we dibinim, Lı xasbaxçe mêvan bûma Cot keziyên reş bir tinim
Nav fincana şerava reş Bıra pêxas, tazibûma Ramûsana şeva pêşin
Dême teyi reş dibinim. Jı evina te, her têrbûma. Dıkım axin û bir tinim*

KARLANÊ ÇAÇAN

NAMEYEK

JI INSTITUYA KURDAN

LI PARİS

Hevalên Hêja

Spasên germin ji bo şandina kovara "Roja Nû".

Em gelek dilşane ku niha "Roja Nû" seranser bi kurdi derdikeve, jê ra jiyanêke dirêj daxaz dikin û hêvidarên ku ewê di şerê ji bo parastin, vejin û pêşvabirina çanda kurdi da roleke berbiçav bileyize.

Tevi silav û daxwaziyên me yê qençtirin.

Kendal Nezan

TU KES NEHATINE BIRKIRIN
TU TIST NAYÊN BIRKIRIN



DOKUMENTEKE
DÎROKÎ
SAL
1932

Çawa tê zanin, diroka (tarix, mê-
jû) Kurdistanê da gelek rojên tîrş -
tal û gelek rojên reş hene. Paşi ser
hildana Çiyayê Giridaxê (1930) zor-
destiyên li ser gelê Kurd hîn ji li
Tirkîyê tûjtir bûne. Li Kurdistanê
cendekê çend gundiyên belengaz li ber
bajarê Bitlisê, li ber belediya ba-
jêr ji bo çavê gel (xelq) bitirsînin
jî vana yek ji, li jêr tê xuyanê. Li
tevqirkirînê (jenosîd) mezûn bi des-
tê dewleta Tirk da hatine pêk anin.
Ev sûreta (şakîl), li tu cihêki
da ne hatiye weşandin, sûret heya ni
ha, di arşîva kovara "Roja Nû" da ha
tîbû parastin.